Rupel 1eminn++++++++++++:Layout 1 03.12.2009 17:20 Page 1

# ‘Piştgiriya berxwedana li Edrayê bikin’

Li rojavayê Kurdistanê 300 girtiyên PKK û PYD’ê li dijî zilm û zora dewleta Sûriyeyê 36 roj in di greva birçîbûnê de ne. KONGRA-GEL got ku divê gelê kurd piştgiriya girtiyên li Edrayê bike

### 36 ROJ IN DI GREVA BIRÇÎBÛNÊ DE NE

Serokatiya KONGRA-GEL bi daxuyaniyekê bal kişand ser rewşa girtiyan û diyar kir ku grev niha di asteke krîtîk de ye û wiha got: “300 girtiyên PKK û PYD’ê ku greva birçîbûnê dabûn destpêkirin, 36 roj in di grevê de ne. Em bang li rayedarên dewletê dikin. Bila daxwazên wan bi cih bînin. Daxwaza me ev e ku rayedarên dewleta Sûriyeyê bi hîstiyarî tevbigerin.”

### ‘DIVÊ GELÊ KURD BÊDENG NEMÎNE’

KONGRA-GEL got ku divê li hemberî îşkence û pêkutiyên li ser girtiyên li girtîgeha Edrayê di serî de NY, KE, YE û saziyên din bikevin nava hewldanan û wiha got: Her wiha em bang li hemû gelê xwe dikin. Bila piştgiriyê bidin girtiyên Sûriyeyê. Ji bo daxwazên wan dengê xwe bilind bikin. Ev peywireke wijdanî ye. Divê her kes peywira xwe bi cih bîne.”... RÛPEL - 4



### Dilê me li rojavayê Kurdistanê diavêje

Li Girtîgeha Edrayê ya Şamê ev 36 roj in 300 zarokên gelê me yên herî bedew, dilsoz û leheng li hemberî dîktatoriya Baas a Şamê bi çeka xwe ya bi tenê, bi bedena xwe berxwedaneke bêhempa li ser rûpelên dîrokê neqiş dikin. 300 dilên berxwedêr ên li Edrayê ji bo parastina hemû nirx û hêjahiyên gelê kurd û mirovahiya hemdem diparêzin. Li hemberî zilm û zorê, li hemberî tarîtiyê nûneriya hemû nirxên gerdûnî yên bi keda mirovahiyê gihiştine roja me dikin.. *Nivîsa Azîz OGUR R.2*


# ROJEV

4 Kanûn - În 2009 E-mail: awelat2002@yahoo.com Buha: 50 Ykr Hejmar: 22


### Modernîte li gorî xwe şîrove dike

Modernîteya kapîtalîst mirov ne weke civakî, weke kesayî digire dest, hunermend jî di nava vê destgirtinê de weke amûrekê dinirxîne. Ji bo ku ajoyên civakê sor bike, berî her tiştî ajoyên hunermend sor dike. Ji ber baş dizane ku tenê dikare bi vê riyê civakeke bênijad û bêrûmet bê afirandin...

ALÎ HAYDAR KAYTAN R.2

# ‘Gel li rûmeta xwe xwedî derdikeve’

Serokê Konseya Rêveber a KCK’ê Murat Karayilan, dijwarkirina şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan weke mercên cidî yên şer bi nav kir. Karayilan, got ku Ocalan ji bo gelê kurd nasname û abîdeya rûmetê ye û gelê kurd li rûmeta xwe xwedî derdikeve

### ‘OCALAN LI KURDISTANÊ ÎRADEYEK E’

Karayilan diyar kir ku dewleta tirk di bin navê pêşîvekirinan de, pêvajoyek daye destpêkirin, lê maskeya wan ket û wiha got: “Pêwîst e zanibin ku Ocalan li Kurdistanê îradeyek e. Yên ku Ocalan wek îradeya xwe destnîşan kirine jî, gelê kurd e, helbet dijberiya li dijî îradeya xwe qebûl nake.”

### ‘GELÊ KURD XWEDÎ ÎNSIYATÎF E’

Karayilan, bal kişand ser rol û mîsyona Erdogan û wiha got: “Rola Erdogan, şikandina îradeya gelê kurd e, tasfiyekirina Tevgera Azadiya Kurd e. Ev aşkera bûye. Divê her kes vê bibîne û zanibin.” Karayilan, destnîşan kir ku li hemberî vê tasfiyeyê gelê kurd xwedî îrade û însiyatîf e.

### ‘DIVÊ JIN Û CIWAN ROLA XWE BILÎZIN’

Karayilan, bang li ciwan û jinên kurd kir ku di vê pêvajoya ku jiyana Ocalan di talûkeyê de ye helwesta xwe nîşan bidin û wiha got: “Ciwanên kurd li metropolên Tirkiyeyê berxwedaneke dîrokî destnîşan dikin. Pêwîst e her kurdistanî bi heman giyanî tevbigerin.”... RÛPEL - 8



Gelê kurd ji bo Ocalan li ser piyan e... R.4

### OCALAN: DI BINÊ BÎRÊ DE ME

Parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, bi muwekîlê xwe re hevdîtina hefteyî ya asayî pêk anîn. Di hevdîtinê de Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan têkildarî rewşa xwe agahî dan û diyar kir ku ew wekî di binê bîreke kûr û tarî de be. Ocalan, da zanîn ku ew nikare bêhnê bide û bistîne û wiha got: "Dema ez radizêm ez pir zehmetiyê dikişînim ku bêhnê bidim û bistînim. Wekî ez di binê bîreke kûr de bim. Pirsgirêkên min ên tenduristiyê didomin." Parêzera Ocalan, Hatîce Korkut, bersiv da gotina Wezîrê Dadê Sadullah Ergîn a 'Girtîgeha Îmraliyê li gorî standard û pîvanên YE'yê ye' û got: "Girtîgeheke ku hesta wekî binê bîrê bi girtiyan re çêdike mirov nikare bêje li gorî standardên YE'yê ye.”... RÛPEL-5



### CHP li dû sextekariyê ye

CHP’a ku li Kurdistanê tabeleya wê jî nemaye serî li rê û rêbazên qirêj dide. Derket holê ku li Geverê bi îmzeya Baykal kartên endamtiyê yên sexte hatine çêkirin. Di kartan de agahiyên nasnameyan û wêneyên kesan jî cuda ne... RÛPEL - 3

### Xwe li goran jî ranagirin

Li gundê Kel ê bi ser Çardêrana Wanê abîdeya ku ji bo xwendekarê lîseyê Îbrahîm Atabay û 2 gerîlayên HPG’ê yên bi saxî hatibûn girtin û piştre hatibûn qetilkirin ji aliyê leşkeran ve bi hinceta li eraziyê dewletê hatiye çêkirin, hate hiweşandin... RÛPEL - 3



### Karên darazê JÎTEM’ê dikir

Derket holê ku endamên JÎTEM’ê, cerdevan û îtirafkarên ku ji 55 cînayetên li Amedê têne darizandin 3 salan li Cizîrê hemû karên edlî kirine û qereqol berteref kirine. 2 fermandarên qereqolê ku îfade dan Dozgerê Komarê yê Amedê Ergun Tokgoz, diyar kirin ku hemû karên fermî yên wê demê ji aliyê Cemal Temîzoz ve hatine kirin... RÛPEL - 3

**ŞAREDARÊN WANÊ**

### Gelê kurd bêrûmetiyê qebûl nake

Şaredarên DTP’î yên Wan û navçeyên wê xwestin di demeke nêzîk de şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan baş bibin. Şaredarê Wanê Bekîr Kaya diyar kir ku gelê kurd kiryarên li ser Ocalan tu carî qebûl nake û divê hikûmet bi lezgînî dest ji vê biryarê berde... RÛPEL - 5

**TEV-ÇAND**

### Divê hunermend li dijî kirinan bêdeng nemînin

Komîteya Çand û Hunerê ya KCK’ê (TEV-ÇAND) tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kir, ji hunermendan re banga hîstiyariyê hat kirin û hat gotin ku rewşenbîr û hunermend wijdana gel in û Ocalan jî rêberê gelekî ye, divê li hemberî wehşeta Îmraliyê bêdeng nemînin... RÛPEL - 9

**JINÊN KURDISTANÊ**

### Dê çalakiyên xwe heta dawiyê bidomînin

Jinên kurd bal kişand ser rewşa Ocalan û diyar kir ew ji rewşa tenduristiya Ocalan bifikar in. Jinan got ku Girtîgeha F a ji hêla CPT’ê ve hatî avakirin tenê xapandinek e. Jinan xwest CPT û DMME heyetekê bişînin Îmraliyê û heta daxwazên wan qebûl bibin dê çalakiyan bidomînin... RÛPEL - 7

**KNK**

### Ocalan xeta sor û stratejîk a gelê kurd e

KNK’ê diyar kir ku gelê kurd Ocalan weke îradeya xwe ya siyasî qebûl kiriye û ji ber vê yekê helwestên li dijî Ocalan tu carî qebûl nake. KNK’ê destnîşan kir ku Ocalan xeta sor û stratejîk a gelê kurd e, divê Ocalan serbest bê berdan û weke muxatab bê qebûlkirin.

www.arsivakurdi.org



Azîz Ogur
abdulazizogur@hotmail.com

# Rojavayê dilê Kurdistanê

Bi peymanên navneteweyî yên bi mebesta ji holê rakirina vîn û hêza kurdan hatin mohrkirin de Kurdistan kirin 4 parçe. Her çiqasî sînorên zexm hatibin danîn jî di navbera parçeyên Kurdistanê de di bin desthilatdariya Tirkiye, Îran û Iraqê de ji ber rewşa erdnîgariyê û çiyayên bi heybet bi tu awayî qutbûneke li gorî dilê dewletên mêtinger û hêzên navneteweyî pêk nehat.

Lê belê di destnîşankirin û kişandina sînoran de rojavayê Kurdistanê yê di bin desthilatdariya dewleta Sûriyeyê de kete rewşeke cuda. Rojavayê Kurdistanê... Gelek nav lê hatin kirin; Başûrê Biçûk, Binxet, Başûr-Rojavayê Kurdistanê, Biçûkê Bira, Kurdistana Sûriyeyê û hwd.

Herî zêde êş û azara sînoran kurdên li vî parçeyî di dilê xwe de hîs kirin. Herî zêde ew bi tenê man. Ne çiyayekî xwe di rojên qewimînin giran de lê bigirin hebûn ne jî derfeteke din. Li pêşiya wan rejîmeke zalim û şovênîzma ereb, li pişt wan zeviyên mayinan têlên direhî, kemînên leşkerên roma reş...

Tevî vê îzolasyon, tenêhiştin, qutkirina ji 3 parçeyên din ên Kurdistanê jî dikare were gotin hêrî zêde li vî parçeyî stranên azadiyê hatin strîn, kêfxweşî, êş, azar, serkeftin û têkçûnên li tevahiya Kurdistanê ji lêvê mirovên li vir dibûn helbest û sînor derbas dikirin. Hişê wan, xeyalên wan, hêviyên wan, xewnên wan tu carî li ber sînoran ranewestiyan.

Di rojên herî giran, di demên faşîzma dewleta tirk de dilê kurdên serxetê (bakur) bi agirê Newrozê yê ji rojavayê Kurdistanê germ dibû.

Rojava ji bo serhildêr, mehkûm, şoreşger û rewşenbîrên kurd ên ji her aliyê Kurdistanê ve ji ber zilma mêtingeran direviyan stargehek bû. Ne tenê mala xwe, dilê xwe ji wan re vedikirin.

Li navlêkirina 'biçûkê bira' mêze nekin, di têkoşîna azadiya Kurdistanê ya li hemû parçeyan de, ji aliyê madî û manewî ve xwediyê keda herî zêde dîsa ew bûn. Di têkoşîna gelê kurd a li başûrê Kurdistanê de di nav her yekîneyeke pêşmerge de ciwanên Rojavayî hebûn. Gelî, zinar, lat nema ku ciwanen rojavayî ne ketin erda pîroz. Bi derketina tevgeza azadiya Kurdistanê ya pêşengiya PKK'ê de êdî rojavayê Kurdistanê ji parçeyekî ku hêz û destekê bide şoreşê wêdetir bûbû qada herî girîng a têkoşînê. Malovaniya Rêberê Gelê kurd dikir û navendiya rêvebirina têkoşînê. Gel li ser piyan bû, her kêliya jiyana wî di xizmeta şoreşê de bû. Li ser sînor mayin dihatin zêdekirin, têlên direhî bilindtir dikirin, kozik û kemînên leşkerên tirk zêtir dibûn, teknolojiya herî pêşketî dihate bikaranîn, lê herikîna keç û xotan a ber bi çiyayên pîroz ve her diçû zêdetir dibû. Ji Botan, Behdînan, Zap û Zagrosê heta bi Mêrdîn, Serhed, Xerzan, Dêrsim, Erziromê bihostek axa Kurdistanê nema ku ciwanên rojavayî lê negeriyan, li ser şer nekirin û xwîna xwe ya pîroz ne rijandin.

Rojava ku tevî hemû zext û dijwariyê jî serî ne tewand bû hedefa bingehîn ya mêtingeran. Mijareke bingehîn a hevkariyên di navbera Tehran-Şam-Enqere-Bexdayê de jî ji holê rakirina îradeya azad a kurdên rojava bû. Lewma di bin îşkenceyê de tên qetilkirin, tên windakirin, tên koçberkirin, bi polîtîkayên taybet birçîbûn tê ferzkirin û tên koçberkirin. Heta ciwanên leşkeriya wan dikin jî yek bi yek tên qetilkirin.

Rojava car caran bi tenê ma, car caran neçar, car caran di navbera şovenên ereb, rejîma xwînrij û mayinên bêbext de hate qirkirin lê tu caran serî ne tewand.

Ciwanên ku bi çanda berxwedana Mazlûm, Xeyrî, Kemal mezinbûn û gihiştin sir û raza azadiyê di şert û mercên herî giran de di zîndanên rejîma zalim a Şamê de li ber xwe didin. Berxwedana Edra, berxwedana 2'yemîn a Amedê ye. Qada têkoşîneke bêhempa ya rûmeta mirovahiyê li hemberî zilm û zorê ye.

Li Girtîgeha Edrayê ya Şamê ev 36 roj in 300 zarokên gelê me yên herî bedew, dilsoz û leheng li hemberî diktatoriya Baas a Şamê bi çeka xwe ya bi tenê bedena xwe berxwadaneke bêhempa li ser rûpelê dîrokê neqiş dikin. 300 dilên berxwedêr ên li Edrayê ji bo parastina hemû nirx û hêjahiyên gelê kurd û mirovahiya hemdem diparêzin. Li hemberî zilm û zorê, li hemberî tarîtiyê nûneriya hemû nirxên gerdûnî yên bi keda mirovahiyê gihiştine roja me dikin... Mîna Mazlum, mîna Xeyrî, mîna Ferhat, mîna Kemal...

## Bandorên modernîteya kapîtalîst ên li ser kesayetiyê -II-

# Modernîte li gorî xwe şîrove dike

ALÎ HAYDAR KAYTAN

Modernîteya kapîtalîst mirov ne weke civakî, weke kesayî digire dest, hunermend jî di nava vê destgirtinê de weke amûrekê dinirxîne. Ji bo ku ajoyên civakê sor bike, berî her tiştî ajoyên hunermend sor dike. Ji ber baş dizane ku tenê dikare bi vê riyê civakeke bênijad û bêrûmet bê afirandin.

Bêrîkirinên hunermendên ku qaşo ketiye vê riyê êdî cuda ne. Ew êdî ne wijdana civakê ye, amûrê polîtîk yê pergala desthilatdar e. Ew êdî tenê ji bo xwe heye. Berhem û têşeya wî ya wan pêşkêşkirinê, tenê ji bo jiyana xwe ye. Her ku diçe tevahî darazên xwe yên nirxên exlaqî datîne aliyekî. Nabîne yên ku wî dişopînin ji bo çi wî dişopînin.

Huner bi seks û sporê ve şîrove dike û pêşkêşiyeke sosret pêk tîne. Ji bo wî bi xwe kî çiqas û ji bo çi bi wê pêşkêşkiriya xwe qezenc kiriye ne girîng e. Pêşgumana "ez çiqas pere qezenc dikim, ez ê çi qas luks bijîm" li plana pêş e.

**Nirxê komunal esas bigire**

Xwe li jorî civakê dîtin, dibe nexweşiya herî bingehîn ên kes û qismên ku xwe weke hunermend pênase dikin. Ev nexweşiya ku çavkaniya wê ezezîgeriye, di hunermendan de hîn kûrtir tê jiyîn. Ev nexweşiya ku jê re tê gotin kaprîsa hunermend jî, serî li her rê û rêbazên xwe cuda dayîna nîşandan dide. Wiha ku, ev cihêwazî kes dibe qutbûna di asta herî jor de. Dema xwe di asta herî jor de bi vî rengî pêşkêş dike, ev yek rê li ber çavkoriya ezezîgeriyê vedike û di heman demê de nîşandeka mirov dikare çawa ew qas biçûk bibe jî pêşkêş dike. Helbet ev dibe nexweşiyeke giştî ya modernîteyê. Bila neyê jibîrkirin ku di roja me ya îro de ku civak heta hucreyên xwe hatiye parçekirin de kes nikarin bi tena serê xwe bibin vîn û wê nikaribin pêşketineke serbixwe ango her tiştî bidin nîşandan. Divê kesek xwe weke "ez vîn im, keda min aydê min e" nexapîne. Du vînên bingehîn ên roja me hene. Şexs, qabiliyet û nirx tenê dikare çavkaniya xwe yan jî civaka ku em jê re dibêjin dewletger desthilatdar bigire, yan jî ji nirxên civaka komunal demokratîk ku xwe dispêre şoreşa neolîtîk bigire. Ji derveyî van nikare behsa vîna kesekî/ê ya serbixwe were kirin. Eger bibe jî ev xapandineke pir mezin e.

Bi kurtasî bi qasî huner civakî ye, ew qas jî karê hilbijarkê ye; riya yekbûna heta dawiyê bi nirxên ku ew afirandiye re ye. Mînak hunermendên heta dawiyê binirx ên ku têkoşîna me afirandine hene. Şehîd Sefkan, Mizgîn, Serhad, Halîl Uysal, Delîla, Sarya û hêj bi hezaran wekî van…Nêzîkatiya van ya ji hunerê re dida nîşan ku, huner di heman demê de qada têkoşînê û sehaya mîlîtaniyê ye. Eger bi xeyalan re jî be huner sehaya ji nû ve afirandina jiyanê be, wê demê jî hunermend weke mîlîtanekî tevli vê afirandina ji nû ve dibe. Ji ber ew pisporê afirandine ye. Nûbûnê diafirîne.





Dema modernîteya kapîtalîst xwe hemdem û pêşketî nîşan dide, ji bîr nake ku gelên Rojhilat jî paşverû û hov nîşan dide. Ji xwe paşketî û pêşketinê jî li gorî pîvanên xwe digire dest

Marks gotibû 'fîlozof tenê xwe bi şîrovekirina cîhanê ve bes dibînin, lê ya pêwîst guhartina cîhanê ye'. Li vir ji felsefê û yên bi wê re mijûl dibûn re wezîfekeye nû bar dikir. Ev wezîfeya nû, ji bo huner û hunermend ku herî kêm di jiyanê de bi qasî felsefeyê rola wê hebû, pêwîst e. Ango gotina "ez şîrove dikim, bila yên din bikin; ez dibêjim, bila yên din biguherînin, bila li gorî wê bijîn" dibe durûtiyek. Ev nêzîkatî li hemberî Mizgînan, Delîlayan, Sefkan û Xelîl Uysalan dibe bêrêziyek. Ji ber wan beyî ku bêjin "jiyana min, hunera min, şîroveya min, berhema min" weke dilopeke çemê gel an ku têra xwe jê vexwaribûn sekna mînak a tevlîbûna ji vê çemê re ya heya dawiyê dane nîşandan.

**Dîrokê berovajî dikin**

Helbet mijara me ne tenê huner û hunermend e. Lê ji bo ku em bidin nîşan ku em li dijî modernîteya kapîtalîst huner û hunermend, dîsa di sekna mîlîtan de û vê giyanê ji civakê re qezenckirinê de weke riyeke herî bingehîn digirin dest û bi vî rengî dipejirînî, me ev nivîsand. Ji bo em bidin nîşan ku kesayetên civakeke hatiye bêdîrok kirin çiqas ji rêşaşiyê re vekirine, me ev nirxand û girîng dît. Divê neyê jibîrkirin ku di nava daneheviyeke dîrokî de bêrîkirinên civakê em afirandin. Ev afirandin jî di serî de Rêber APO, têkoşîna azadiyê, zanista bilind û kevneşopiya rêxistingeriyekê derxiste holê. Di mercên herî bê aman de û di kêliyên herî bê hêvî de jî hêza bi xwe bawerkirin û têkoşînê da me.

Rêber Apo dibêje, "dîrok û kevneşopî çi be, roja me û pêşeroj jî ew e". Kesên ku ji netewe û civaka xwe qut bûye, helbet nikare bibe hunermend. Dema modernîte xwe hemdem û pêşketî nîşan dide, ji bîr nake ku gelên Rojhilat jî paşverû û hov nîşan dide. Ji xwe paşketî û pêşketinê jî li gorî pîvanên xwe digire dest. Her cureya kevneşopiya ku civak di nava erdnîgariya xwe de afirandiye tune dihesibîne û kevneşopiyeke zehar (ucube) ku em dikarin jê re bêjin kozmopolît diafirîne. Hewl dide vê yekê jî herî zêde bi riya hunerê re bike ango hunerê weke amûra bênasnamekirina civakek û kesayetekê bikar tîne. Vê yekê wisa bi xemilandin û gulgulîkirinekê ve dike ku, gelek kesên ku ji xwe re dibêjin 'hunermend', bi vê xapandinê ji xwe re û ji nirxên ku ew afirandine re biyanî tê kirin û wî tîne rewşa biçûkdîtina van nirxan. Ev xapandinek e. Di vê rewşê de xwe ji muzîka ku bikar tînin heta alavên ku hildibijêrin, ji mijarên ku hildibijêrin heta têşeya wê ya şîrovekirinê re bêrûmetî û bênijadiya ku derketiye holê tê jiyîn. Navê vê jî dikin pêşketin. Lê mixabin ev ne pêşketine, berevajî vê dejenerebûn.

**Peyam divê azadî be**

Di vir de çelexwarkirinek heye; ji zêdetirî şaş fêmkirinê, ne bêrîkirinên civakê, xwe jiyîn heye; ne tenê ji kevneşopiyê, ji îro û pêşerojê jî qutbûn ango gindirîna ji tarîtiyên bîreke bêbinî û kor heye. Helbet ev gindirîn wêdetirê biyanîbûnê, tê wateya şibandina dijminê xwe, xwe perestina wî ya û radestbûna ji dijminê xwe re. Di wê hêlê de hunermendek neçare bibe pêşengê kêlî û bi kêlî bicîhana nasnameya neteweyî û civakî. Di rewşa dijberê vê de hunermendê ku radest bûye; bi berhemên hunera xwe ve radestiyê ji civakê re ferz dike. Hela hela hunermendê ku îdia dike ew hunermendê gelê kurd ku dizane azadî û têkoşîna ji bo wê tê çi wateyê û bi jiyîna rojane re fêrî vê dibe vê nebîne û nizanibe, ev dibe xefleteke cidî.

Dema bîrdoziyên modernîteya kapîtalîst di wateyekê de dawiya mirovahiyê weke temînata mayîndebûna xwe îlan dike û hewl dide vê bi her cureya amûrên madî û manewî ve îspat bike, beyî ku veguhere bê hêvîtiyeke herî biçûk weke qîra hêviyê huner; di xeyalên hunermendê kurdistanî de divê ji cîhanê re peyama azadiyê were gihandin. Li gorî me divê wezîfeya herî bingehîn a hunermendan ev be. Nexwe eger Rêberê me ku em afirandine, têkoşîna azadiya gelê me ya pîroz û bi deh hezaran şehîdên me ku ew gihandiye vê rojê û gelê me ku tevî her cureya zilm û xistinê di jiyîna bêrîkirina xwe ya azadiyê de israr dike bêne jibîrkirin, wê ji bilî bûna palyaçoyê modernîteyê, tu hilbijark nemîne. Weke ku bi feraseteke jiyanê ku li ser palyaçobûnê hatiye damezirandin rast nayê jiyîn, wê çalakiyeke rast a hunerî û pêşkêşkirinek jî pêk neyê. *(Qediya)*

ROJEV

**Zozan Basın Yayın Adına**
**İmtiyaz Sahibi:** Eser UYANSIZ
**Yazı işleri Müdürü:** Mustafa AGGÜL

**Yönetim Yeri:** Diclekent Bulvarı Termil Apt. Kat:3 No: 9 Kayapınar / DİYARBAKIR
**İdare Tel:** 0 (412) 251 38 88
**Yayın (Weşan)**
**Tel:** 0 (412) 237 48 91 **Fax:** 0 (412) 237 48 89
**Baskı(Çap):**
**Stenbol:** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basın Yayın Tan. San. Tic. Ltd. Şti., Telsizler Mevki Beşyol mah. Akasya Sok. No:23/A Küçükçekmece / İSTANBUL Tel:0 (212) 580 63 81
**Edene:** Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtçılık, AŞ. İstiklal Mah. İstiklal Cad. No:44 Seyhan/ ADANA
**Yaygın Süreli Yayındır**

# Ciwanan çalakî gur kirin

**Çalakiyên şermezarkirina girankirina tecrîda li ser Ocalan hê jî didomin. Ciwanan Silopî wergerand qada şer û çalakî li Mêrsînê jî heta sibê dom kirin. Li piraniya cihan di nav gel û polîs de pevçûn derketin**

Bi hezaran ciwan li taxa Başakê ya navçeya Silopî ya Şirnexê civiyan û zext û tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kirin. Ciwanan, meşale vêxistin û ber bi riya Îpekê ve meşiyan.

Di meşê de posterên Ocalan û alên PKK'ê hatin hildan. Di meşê de bênavber dirûşmên "PKK gel e, gel li vir e", "Bila destên dirêjî Ocalan dibin, bişkên", "Em dê cîhana bêyî Ocalan bi serê we de hilweşînin" û "Tolhildan" berzkirin. Piştre cîwanan Riya Îpekê ji trafîkê re girt û li ser vê jî polîs bio gazên îsotê û avê êrîşê ciwanan kir. Polîsan bi awayeke tund êrîşê girseyê kir û bi cop, dar û qalasan li çalakvanan xist. Girseyê jî bi keviran bersiv da êrîşa polîsan û gelek polîsan birîndar kirin. Di dema pevçûnê de polîs bombeyên gazên avêtin der û dorê û li ser vê yekê jî glek jê zarokên biçûk, mirovên der û dorê jî ji gazê bandor girtin. Paşê pevçûn li kuçeyan belav bûn. Ciwanan li kuçeyan barîkatan ava kirin û di nav wan û polîsan de pevçûnekek mezin derket. Bûyer li taxên din ên navçeyê jî belav bûn. Pevçûn, dî taxan de heta serê sibê dom kirin û tax wergeriyan qada şer. Her wiha gelek ciwanan, demeke dirêj riya, Silopî û Xabûrê ji trafîkêre girtin.

**Li Rihayê pevçûn**

Li taxa Suleymaniyeyê ya Rihayê, bi sedan ciwan li taxê civiyan û bi meşeke li dar xistin. Di meşê de ciwana bênavber dirûşimên" Bijî Serok Apo", "Nêzîkatiya ji Ocalan re sedema me ya şer û aştiyê ye", "Ciwan ferdayiyên Apo ne" û "Bêyî Serok jiyan nabe" berz kirin. Di navbera ciwan û polîsan de pevçûn derket. Polîsan bi panzêr û obmbeyên gazan êrîşî ciwanan kir. Ciwanan bi molotofan bersiv dan êrîşa polîsan. Her wiha li navçeya Pirsûsê ya Rihayê jî du erebe bi molotofan hatin şewitandin.

**Li Êlihê heta sibê çalakî**

Bi munasebeta şermezarkirina girankirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi sedan ciwan li taxên Petrolkent, Yavuzselim, Îpragaz, Baglar, 19 Mayis û Huzurê civiyan. Ciwanan di nav taxan de meş li dar xistin.

Ciwanên li taxê civiyabûn dirûşmên 'Bijî Serok Apo', 'PKK gel e gel vir e', 'Silav, silav, hezar silav ji Îmraliyê re' û 'Em ê cîhaneke bê Ocalan bi serê we de bînin xwarê' berz kirin. Ciwanên ku dirûşm berz dikirin li nava taxê meş li dar xist û belav bûn.

Ciwanên ku di taxan de civiyan, Riya Koçerlerê bi molotofan ji trafîkê re girtin. Ciwanan bênavber dirûşimên wekî "Bijî Serok Apo", "Ocalan, Ocalan", "PKK gel e gel li vir e", "Hezar silav ji Îmraliyê re" û ""Em dê cîhana bêyî Ocalan bi serê we de hilweşînin" berz kirin. Polîs bi panzêr û gazên îsotê êrîşê ciwanan kir. Ciwanan jî bi fîşekên hewayî bersiv dan êrîşa polîsan. Li Êlihê heta sibê çalakî dom kirin. Hat hînbûn ku polîsan ciwanekî bi navê Nemet Çetinkaya girtine binçavan.

**Çalakî belav dibin**

Çalakiyên şermezarkirinê yên li Mêrsînê her diçe zêdetir dibin. Bi sedan ciwan li taxên Fartettinpaşa û Şahinê yên navçeya Tarsûsê civiyan û heta serê sibê bi polsaîn re ketin pevçûnê. Ciwanan heta serê sibê, destûr nedan ku polîs têkevbin navçeya Tarsûsê û heta sibê li dora agir dîlan girtin. Di çalakiyan de ciwanan posterên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û alên KCK'ê hildan û meşan li dar xistin. Hat hînbûn ku li navçeyên Akdeniz û Toroslarê jî hin çalakiyên şermezarkirinê pêk hatin û gelek erebeyên polîsan hatin şewitandin. **AMED**

## Li Erdîşê panzerê da ser zarokekî

Li navçeya Erdîşê ya Wanê, bi armanca şertên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar bikin bi sedan kesan dest bi meşê kir. Piştî polîsan mudaxeleyî çalakvanan kir, alozî derket û di aloziyê de kesek bi giranî birîndar bû. Panzera polîsan da ser zarokekî û zarok bi giranî birîndar kir.

Koma li ber avahiya DTP'a Erdîşê hate cem hev bi dirûşmeyên "Bijî Serok Apo", "PKK gel e gel li vir e" dest bi meşê kirin. Koma li ser Kolana Dalanê dest bi meşê kir rastî mudaxaleya polîsan a bi bombeyên gazê hat. Komê jî bi keviran bersiv da polîsan û alozî derket. Li gelek cihên navçeyê bûyeran dest pê kir û demeke dirêj dom kir. Di encama bûyeran de kesek ji serê xwe bi giranî birîndar bû. Birîndar rakirin Nexweşxaneya Dewletê ya Erdîşê.

Bûyerên piştî mudexaleya li hemberî meşê dest pê kirîn, li tevahiya navçeyê belav bûn, di domin. Di çalakiyên li kolanên wekî Dalan, Zeylan, Kişlayê û Riya Tugayê didomin de, di navbera polîsan û çalakvanan de pevçûn zêde dibin. Li ser bûyeran esnafan jî derabayên xwe girtn. Hate zanîn ku zarokekî ku nav wî nehate zanîn panzerê da ser, bi giranî birîndar bûye. Zarokê birîndar bûyî rakirine Nexweşxaneya Dewletê ya Erdîşê. Her wiha hate ragihandin ku ji Wanê, yekîneyên taqviyeyê şandine Erdîşê.



## Li Wan, Kop û Nisêbînê çalakî

Li Wan, navçeya Kopê ya Mûşê û navçeya Nisêbînê ya Mêrdînê bi armanca balkişandina ser şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan çalakî pêk hatin û hate xwestin ku mercên Ocalan bêne başkirin

Li navçeya Kopê ya Mûşê, girseya ku bi armanca şermezarkirina şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li ber avahiya DTP'ê ya Kopê civîyan meş pêk anî. Nêzî hezar kesên ku di navde Serokê DTP'a Mûşê Nîmet Sezgîn, Şaredarê Kopê Zîya Akaya, Şaredara Gimginê Gulşen Deger, Şaredarê Melezgirê Nurî Balci, şaredarên bajarokên Saripinar, Yemişen, Erentepe, Rustemgedik, Elmakaya, Artînîs, Mollakent hebûn heta Mizgefta Navendî meşiyan. Girsê pankarta "Ji Ocalan re azadî" û dirûşmeyên "Bijî Serok Apo", "Bêyî Serok Jiyan nabe" berz kirin. Li ser navê girsê rêveberê DTP'ê yê Kopê Vedat Topçu, daxuyanî xwend û diyar kir ku nêzîkatiya li dijî Rêberê Gelê Kurd nêzîkatiya li hemberî gelê kurd e û polîtîkayên AKP'ê şermezar kir. Serokê DTP'a Mûşê Nîmet Sezgîn jî destnîşan kir ku polîtîkaya înkar û îmhayê bi salan e li dijî kurdan didome û wiha got: "Di demê dawî de di şexsê Brêz Ocalan de vê polîtîkaya xwe didin jiyandin. Êdî gelê kurd ne wekî berê ye. Dikare li vîna xwe û rêbertiya xwe xwedî derkeve. Qet bila kes hêvî neke ku gelê kurd li hemberî pêkanînê Îmralî bêdeng bimîne. Gelê kurd dê têkoşîna xwe bidomîne." Di çalakiyê de girsê bê navber dirûşmeyên "Em dê cîhana bêyî Ocalan bi serê we de hilweşînin" berz kir. Girse piştî daxuyaniyê heta avahiya DTP'ê meşiyan û dawî li çalakiya xwe anîn.

**'Bila Îmralî bê girtin'**

Serokê Lijneya Koordînasyona Bajarê wanê ya TMMOB'ê Şevket Akdemîr, têkildarî şert û mercên Ocalan li Salona TMMOB'ê daxuyanî da çapemeniyê. Akdemîr, xwest Îmralî bê girtin û wiha got: "Divê di demek nêzîk de heyetek serbixwe biçe Îmralî û lêkolîn bike. Ji bo çareseriya pirsgirêkê û dawîlêhatina rijandina xwînê divê şert û mercên Ocalan bê başkirin.

**Kepeng nehatin vekirin**

Li navçeya Nisêbînê ya Mêrdîn jî esnafan kepeng venekirin. Li navçeyê polîsa tedbîrên berfireh girtin û bê navber anons kirin. 4 kesên ku di çalakiya duh de hatin binçav kirin de, serbest hatin berdan. Lê piştî wê welatiyê bi navê Sezaî Alptekin hate binçavkirin. Xebatkarê Rojnameya Gunluk Hasan Dogan ku hatibû binçav kirin, di bin çavan de rastî lêdanê hat û kamaraya wî hate şikandin. **MÛŞ / WAN / MÊRDÎN**

## Tehemûla polîsan ji bo coşa gel nemaye

Endamên Komên Aştiyê yên bi banga Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ji Qendîl û Mexmûrê hatin, li navçeya Avkevirê ya Agiriyê ji aliyê bi hezaran kesî ve hatin pêşwazîkirin. Girseya ji bo rêwîkirina Komên Aştiyê heta derketina navçeyê meşiyan, di dema vegerê de rastî mudaxaleya polîsan hat.

Endamên Komên Çareseriya Demokratîk û Aştiyê yên ji Qendîl û Mexmûrê hatin, piştî Agirî û Navçeya Diyadînê jro jî li Navçeya Avkevirê bi gel re hatin cem hev. Endamên Komên Aştiyê Gulbahar Çîçekçî, Nizar Buldan, Nurettîn Turgut, Hamiyet Dînçer û ji endamên Yekemîn Koma Aştiyê ya di sala 1999'an de li ser bang Ocalan hatibû Tirkiyeyê Mehmet Şîrîn Tunç, di ketina navçeyê de ji aliyê konvoyêk mezin a wesayîtan ve hatin pêşwazîkirin. Endamên Komên Aştiyê piştî pêwazîkirinê derbasî ber avahiya Rêxistina DTP'ê ya Navçeyê bûn. Endamên komê bi panqartên "Hun bixêr hatin Qasidên Aştiyê", "Mîmarê aştiya yê birûmet Brêz Ocalan e" vekirin û bi dirûşmeyên "Birêz Ocalan", "Bêyî Ocalan em dê cîhanê bi serê we de xerabikin" hatin pêşwazîkirin. Li ser navê komê Gulbahar Çîçekçî, bang li gelên tirk, azerî ecem kir û xwest ji bo herîkina xwînê bi dawî bibe alîkariyê bidin têkoşîna gelê kurd. Çîçekçî, balkişand ser daxuyanî û nûçeyan dema hatin Tirkiyeyê yên wekî "Hesasiyetên gelê tirk hene. Bila çalakî û pêşwazîkirin neyên kirin" û wiha axivî: "Timî dibêjin hesasiyetên gelê tirk. Lê em zanîn ku derdorên van daxuyaniyan didin ên ku di şer û herîkîna xwînê de israr dikin in. Em van hesasiyetan zanîn û fam dikin û xebatên xwe di vê çarçoveyê de dimeşînin."

Çîçekçî, destnîşan kir ku wekî hesasiyetên gelê tirk, ên gelê kurd jî hene û da zanîn ku ligel tê zanîn hesasiyetên gelê kurd kişf in. Çîçekçî bi bîr xist ku Ocalan ji hucreya 12 metrekareyan xistine 6 metre kareyan. Çîçekçî, anî ziman ku ev pêvajoyê ji bo sabotekirina pêvajoya aştiyê ya li Tirkiyeyê ye û ev tişt gotin: "Bila hemû kes bizanibe ku azadiya Ocalan misogeriya aştiyê ye." Piştî axaftinên hatin kirin, Komên Aştiyê berbi navçeya Tutaxê ve ketin rê. Girseya ku bi konvoyê heta derketina navçeyê meşiyan, dema vegerê rastî mudahaleya polîsan hat. Polîsan ku bi bombeyên gazê mudaxaleyê girseyê kir, girseyê jî bi keviran bersiv da. **AGIRÎ**

## Ji bo greva Edrayê piştgirî xwest

Serokatiya KONGRA GEL, greva 300 girtiyên girtîgeha Edraya Şamê ku ev 36 roj in tê de ne silav kir û bang li rayedarên dewletê kir ku pirsgirêk demildest bê çareserkirin.

Serokatiya KONGRA GEL bi munasebeta greva girtiyên PKK û PYD'ê yê Sûriyê daxuyaniyek da. KONGRA GEL di daxuyaniyê de bal kişand ser rewşa girtiyan û diyar kir ku grev niha di asteke krîtîk de ye û wiha berdewam kir: "Em bang li rayedarên dewlê dikin. Bila ji pirsgirêkên girtiyan re bibin bersiv."

Di berdewamiya daxuyaniya KONGRA GEL de wiha tê gotin: "Ji aliyê rejîma Sûriyê ve pêkûtî û zext li ser girtiyan pêk tê. Ji ber vê yekê 300 girtiyên PKK û PYD'ê greva birçîbûnê dabûn dest pê kirin. Ev 36 roje di grevêde ne. Em wekî KONGRA GEL greva girtiyên girtîheta Edrayê carek din silav dikin."

KONGRA GEL di daxuyaniyê de da zanîn ku girtiyên ku ji bo pêkûtiyên derveyî mirovahiyê ketine grevê, der barê rewaşa wan a tenduristiyê tu agahî tuneye û wiha berdewam kirin: "Girtiyên ku ji ber nasnameya xwe ya siyasî û netewî rastî pêkûtiyên derveyî mirovahiyê hatine serî li riyeke wisa dane. Ji bo ku ev pêkûtî bi dawî bin ketin vê grevê. Jiyana xwe niha kirine bin rîskî. Lê ev berxwedana wan ji bo azadiyeyê. Her wiha ev têkoşîneke girîngê. Bi vê têkoşînê xwedî li rumeta xwe jî derdikevin. Greva wan kete roja 36'an. Ji ber vê jiyana roj bi roj di xeterê de ye. Girtî nekarin bi malbat û parêzerên xwe re derkevin hevdîtinê. Lewre der barê rewşa wan de tu agahî jî tune. Der barê daxwazên girtiyan de jî heta niha îdareya girtîgehê tu daxuyanî nedaye û pêngav neavêtine. Em li bang li rayedarên dewletê dikin. Bila daxwazên wan bînin cih. Ji bo ku mirin pêk neyên divê ev demildest raweste. Jiyana wan di bin rîskê de ye. Eger ku mirin derkevin holê dê bûyerên civakî yên ciddî derkevin holê. Daxwaza me eve ku rayedarên dewleta Sûriyê bi histiyarî tevbigerin."

KONGRA GEL di dawiya daxuyaniya xwe de wiha got: "Li hemberî işkence û pêkûtiyên ku li girtîgehan tên jiyîn divê di serî N.Y, KE, YE û saziyên din ji bo girtiyên Edraya Şamê têkevin hava hewldanê û bi ser rayedarên Sûriyê de bikin. Banga me ji bo wan eve ku bila bê deng nemînin. Her wiha em bang li hemû gelê xwe dikin. Bila piştgiriyê bidin girtiyên Sûriyê. Ji bo daxwazên wan dengê xwe bilindg bikin. Ev peywireke vîcdaniye. Ji bo ku rayagiştî tikeve nava hewldanan divê her kes peywira xwe bîne cih.." **BRUKSEL (ANF)**

# Ocalan: Wekî di binê bîrekê de bim

**Rêberê Gelê Kurd Ocalan di hevdîtina xwe ya bi parêzeran re de anî ziman ku tu guhertin di şert û mercên wî de nehatine kirin û got: 'Her wekî ez di binê bîreke kûr û tarî de bim.' Wezîr Ergîn îdia kir ku li girtîgeha Îmraliyê pîvanên gerdûnî hatiye çêkirin**

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di hevdîtina hefteyî ya bi parêzerên xwe re de diyar kir ku ew wekî di binê bîreke kûr û tarî de be û pirsgirêkên wî yên tenduristiyê didomin. Li aliyê din Wezîrê Dadê Sadullah Ergîn îdia kir ku girtîgeha Îmraliyê li gorî standartên gerdûnî hatiye avakirin. Ergîn hem wisa dibêje û hem jî ji bo ku pêkanînên bûne sedema nerazîbûnê vekolin heyetek şand Îmraliyê. Her wiha Komîsyona Mafên Mirovan a Parlamentoyê daxwaza ji bo şandina heyetekê red kir.

Parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, pêr bi muwekîlê xwe re hevdîtina hefteyî ya asayî pêk anîn. Di hevdîtinê de Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi riya parêzerên xwe têkildarî rewşa xwe agahî dan û diyar kir ku ew wekî di binê bîreke kûr û tarî de be. Ocalan, da zanîn ku ew nikare bêhnê bide û bistîne û wiha got: "Dema ez radizêm ez pir zahmetiyê dikişînim ku bêhnê bidim û bistînim. Wekî ez di bin bîreke kur de bim. Pirsgirêkên min ên tenduristiyê didomin."

<u>Îmralî li gorî mewzûatê ye</u>

Wezîrê Dadê Sadullah Ergîn piştî têkildarî şert û mercên Ocalan bi parlementerên DTP'ê re hevdîtin çêkir û soza başkirina mercên Îmralî da, pirsên rojnamegeran bersivand û diyar kir ku Girtîgeha Tîpa F ya Îmralî, li gorî standartan û mevzûatê hatiye avakirin.

Piştî di demên dawî de bi armanca şermerazkirina şert û mercên Ocalan çalakiyên girseyî zêde bûn, Wekîlên Koma DTP'ê yên Parlementoyê Selahattîn Demîrtaş û Gultan Kişanak, bi armanca balê bikşînin ser mercên Ocalan bi Wezîrê Dadê Sadullah Ergîn re hevdîtin çêkirin. Di hevdîtinê de Ergîn soza başkirina mercên Ocalan da parlementerên DTP'ê. Piştre Ergîn têkildarî mercên Ocalan pirsên rojnamegeran bersivand. Ergîn, bêyî ku şert û mercên Îmralî lêkolîn bike, diyar kir ku mercên Îmralî li gorî pîvan û mevzûatê hatiye avakirin. Ergîn, da zanîn ku wan gelek rapor derbarê Girtîgeha nû ya Îmralî de amade kirine û pîvan û standarê girtîhê li gorî yên din hatiye avakirin. Ergîn, anî ziman ku dema dîsa ji bo bi daxwaza li cihê xwe yê berê vegere serî lê bide dê lêkolîn bê kirin.

<u>Wezîr Heyeta xwe rêkir</u>

Wezîr Ergîn dibêje ku şert û mercên Îmraliyê li gorî pîvanên gerdûnî ne, li aliyê din ji bo ku şert û mercan vekolin di bin serokatiya Midûrê Giştî yê Girtîgehan Nîzamettîn Kalaman de heyeteke fermî şand Îmraliyê.

<u>Komîsyon heyetê rênake</u>


Parlamenterê DTP'ê yê Amedê û Endamê Komîsyona Mafên Mirovan a Parlamentoyê Akin Bîrdal ji bo parlamento heyetekê bişîne Îmraliyê serî li komîsyonê da. Komîsyona Mafên Mirovan a Parlamentoyê ji ber serlêdana Akin Bîrdal civiya û daxwaza ji bo şandina heyetekê red kir. STENBOL / ENQERE


Sadullah Ergin

## Hatîce Korkut: Standardên YE'yê li Îmraliyê nîn in

**PARÊZERA** Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan Hatîce Korkut, bersiv da gotina Wezîrê Dadê Sadullah Ergîn a 'Girtîgeha Îmralî li gorî Standard û pîvanên YE'yê ye' û got: "Girtîgeheke ku hesta wekî binê bîrê bi girtiyan re çêdike mirov nikare bêje li gorî Standardên YE'yê ye.

Parêzera Ocalan têkildarî şert û mercên girtîgeha Îmraliyê û daxuyaniyên Wezîrê Dadgê Sadullah Ergîn bertek nîşan da û diyar kir ku Îmralî ne li gorî standartên YE'yê ye. Prz. Korkut, gotina Wezîrê Dadê Ergîn a "Îmralî li gorî standardên YE'yê ye" rexne kir û anî ziman ku muwekîlê wan di bin şertên giran de dijî. Korkut wiha axivî. "Muwekîlê me di bin şertên îzolasyonê de dijî. Hucreyeke tarî û kûr e. Divê hîsa 'Di binê bîrê de' baş bê famkirin. Birêz Ocalan ji bo rewşa xwe ya dawî got 'Ez wekî di binê bîrekê de bim'. Cihê ku hîseke wisa çêdike mirov nikare behsa Standardên YE'yê bike. Tenê lêkolîna rayedarên Wezareta Dadê ne bes e. Divê heyeteke serbixwe lêkolîn bike. STENBOL



## 'Ocalan xeta sor a gelê kurd e'

Nûnerên saziyên sivîl ên Rihayê têkildarî şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, hişyarî kirin û diyar kirin ku rewşa Ocalan neyê guhertin dê êşên mezin bêne jiyandin. Serokê Şaxa Egîtîm Senê ya Rihayê Sitki Dehşet, diyar kir ku lazime nêzîkatiya li hemberî Ocalan wekî nêzîkatiya gelê kurd bê destgirtin.

Serokê Şaxa Egîtîm Senê ya Rihayê Sitkî Dehşet, anî ziman ku dî pêvajoyek ku hêviyên aştiyê bilind bibûn de, girantir kirina rewşa girtîgehe ya Ocalan wekî "Provokasyonê" bi nav kir û da zanîn ku ne dewlet û ne jî AKP dikare ji bin vebala vê yekê derkeve. Dehşet, bi lêv kir ku wekî rêxistinên kedê vê pêvajoyê biguman dişopînin û li gel bandora Ocalan a li ser gel tê zanîn jî giratirkirina rewşa girtîgeha Îmraliyê, dê bibe sedema êşên pêşî lê neyên girtin. Dehşet, anî ziman ku di bin navê "Berlêvekirina Demokratîk" de bi nêzîkatiya Ocalan diwazin kurdan biqedînin. Dehşet, da zanîn ku hezên demokrasiyê ji pêvajoyê bi hêvî bûnê lê niha rastî derdikevin holê û wiha got: "Lazime nêzîkatiya li hemberî Ocalan wekî qêbûlkirina vîna gelê kurd bê qêbûlkirin. Hikûmeta AKP'ê hewl dide kurdên xwe avabikin. Hewl didin pêşengê têkoşîna gelê kurd a demokrasiyê û vîna wan Ocalan biqedînin. Tiştên nebaş ên ku bên jiyîn dê berpirsiyariyê wê li ser AKP'ê be."

Serokê Şaxa ÎHD'ê ya Rihayê Sedat Gozkiran, diyar kir ku Ocalan ji bo alîkariya pêvajoyê hewldanên demokratîk Komên Aştiyê şandin Tirkeyeyê, lê ev gava hevî afirandin cîdî nehate girtin. Gozkiran, anî ziman ku rewşa tendûristiya Ocalan gumanan dide çêkirin û ev tişt gotin: "Girseyek cîdî girîngiyê dide Ocalan. Ji ber vê yekê em bi gumanin ku tendûristiya wî dê li ser girseyan bandorên neyî bike. Cihê Ocalan ê nû li gorî pêşniyarên DMME'ê û CPT'î ve hate amadekirin. Ji ber vê yekê jî lazime ev sazî teşebûsên pêwîst bikin. Ev yek ji bo aştiya Tirkiyeyê girîng e."

**'Xeta sor a gelê kurd e'**

Serokê Şaxa Genel Îşê Sadik Demîr jî, derbirî ku Hikûmeta AKP'ê li aliyêkî dibêje "Vekirina demokratik" lê li aliyê din jî li hemberî Ocalan ku 3 mîlyon û nîv kesî gotiye vîna min e tecrîde dîmeşîne û di ban navê hewldanên de jî şer sordike û wiha pêde çû: "Tirkiyê qala xetên sor dike. Bila bê zanîn ku xeta sor a gelê kurd jî rêberê wan e. Ger tê xwestin bi kurdan re aşîtiyek werê çêkirin, teqez lazime rewşa Ocalan bê başkirin. Nêxwe dê ev helwest bibe îhlalkirnia xetên sor ên kurdan û nerazîbûnên li kuçeyan ên demên dawî jî vê yekî nîşan didin. Demîr, got ku tiştên tên jiyîn encamê polîtîkayên dirû yên AKP'ê ne û xwest CPT mudaxeleyî tiştên li Tirkiyeyê tên jiyîn bike. RIHA (DÎHA)

## Ji şaredarên Wanê daxuyaniya hevpar

Şaredarên Wan û navçeyên wê yên DTP'î bertek nîşanî şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dan û diyar kirin ku di şexsê Ocalan de tê xwestin gelê kurd tecrîd bikin. Şaredaran xwest zû dawiyê li tecrîda li ser Ocalan bînin.

Şaredarên DTP'î yên Wan û navçeyên wê xwestin di demek nêzîk de şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan baş bibe û tecrîda li ser Ocalan bi dawî bikin. Şaredarê Wanê Bekîr Kaya, diyar kir ku Ocalan ji sala 1999'an heta niha di bin tecrîdek giran de tê hiştin û wiha got: "Birêz Ocalan ev 11 sale di bin êrîş û tecrîdek giran de dijî. Herî dawî birêz Ocalan neqlî hucreya 6 metrekare kirin. Bi vê yekê dixazin wî di nava wextê de hêdî hêdî bikujin. Di sala 1999'an de di şexsê birêz Ocalan de gelê kurd dîl girtin. Bi vê yekê ji gelê kurd re dibêjin 'Tu qet nikare bibe vîn. Qada azadiyê ji were tune'. Divê tecrîd û pêkanîna li ser birêz Ocalan ji rêzê neyê famkirin. Biryar ji bo tunekirin û înkarkirna kurdan e. Biryarek siyasî ye. Gelê kurd tu carî vê yekê qebûl nakin. Divê hikûmet bi lezgînî dest ji vê biryarê berde."

**'Em ê bêdeng nebin'**

Şaredara Bajeroka Sixkê ya Wanê Nezahat Erguneş, jî diyar kir ku Ocalan bi salane ji bo xwîna dirje bide sekinandin, di bin tecrîdekî girtan de têkoşînekî mezin dide. Erguneş wiha got: "Fedakariya Ocalan ya ji bo aştiyê bi pêkutiyên tecrîdê sabote dikin. Komên aştiyên ên bi banga birêz Abdullah Ocalan ji Qendîl û Mexmurê hatine Tirkiyeyê hêviyên gelê kurd ên aşitiyê zêde kir. Me hêvî dikir ku piştî 5 girtiyên din ên birine Îmraliyê dê şertên birêz Ocalan baş bikin, lê şûna başbûnê hêj xirabtir kirin. Tû kes vê yekê qebul nake. Birêz Ocalan ji bo aştiyê fedakariyeke gelekî mezîn dike. Kesê hîn kedê ji bo aştiy dide divê di bin şertên tecrîdê de neyê girtin. Ne gelê kurd ne jî nûnerên gelê kurd ên hatine hilbijartin vê yekê tu car qebul nakin. Em dê bertekên xwe di astekî herî bilînd de nişan bidin."

**Armanca dewletê...**

Şaredarê Çelebîbagê yê Erdîşê Veysel Keser ji diyar kir ku pêkutiyên li hemberî Ocalan pêk tînin nayên qebul kirin. Keser ani ziman ku ev 10 sale AKP mirina kurdan û ya Ocalan armanc dike û wiha got: "Li Îmraliyê hucreyên mirinê çêkirinê. Komploya Navneteweyî bi şertên xirab ên girtigeha nû hêj didome. Ev pêkutiye dê ziraré bidin gelê kurd û tirk. Berê jî birêz Ocalan jehir kiribûn û pora wî bi zorê qusandibûn. Herî dawî bi şîdeta fîzîkî gefên mirê li birêz Ocalan hatibûn xwarin. Hemû pêkutî nîşan didin ku dixwazin birêz Ocalan bikujin."

**Windakirina gelê kurd**

Şaredarê Elbakê Îhsan Guler jî, diyar kir ku dê kurd bi her awayî li Ocalan xwedî derkevin û da zanîn ku Hikûmeta AKP'ê bi agir dilîze û wiha got: "Hikûmeta AKP'ê bi tecrîda li ser birêz Abdullah Ocalan dixwaze gelê kurd winda bike. Daxwaza wan qedandina tevgera azadiya gelê kurd e. Gelê kurd ji bo azadiya xwe 50 hezar şehîd dane û bi rêberê xwe ve girêdayi ye. Dê lê xwedî derkeve û heta dawiyê biparêze. Em bang dikin ku bi lêz dev ji vê çûndina bi xetere berdin." Şaredarê Artêmêdê Abdulkerîm Sayan jî, anî ziman ku pêkanînên li Îmaraliyê tên kirin sabotekirina pêvajoyê ye û tê wateya israrkirina rijandina xwînê ye . Sayan, bang li CPT'ê kur û wiha got: "Rêwşa birêz Ocalan a li girtîgehê hatiye girankirin û mafê wî yê jiyanê ji dest digirin. Bi windakirina vîn û rêberê gel dixwazin gelê kurd ceza bikin." WAN (DÎHA)

## DTP ji bo Mexmûrê heyetekê rêdike Başûr



Partiya Civaka Demokratîk (DTP), bi boneya rewşa welatiyên Wargeha Maxmûrê bipirse dê biçe Herêma Federal a Kurdistanê. Cîgira Hevserokên DTP'ê Aysel Tugluk, têkildarî bernameyê agahî dan û diyar kir ku dê di 5'ê kanûnê de dest bi gera herêmê bikin.

DTP bi armanca têkildarî hewldanên çareseriya pirsgirêka kurd û pêvajoyê gel agahdar bikin û nerînên xwe bi gel re parve bikin, heta 15'ê çilêyê sala 2010'an bernameyek amade kir. DTP'ê di çarçoveya vê bernameyê li Serhat û Îzmirê ger dest pê kir û ji ber Cejna Qurbanê navber dabû. DTP'ê piştî cejnê 3 roj civîn çêkir û bernameyek nû derwist. DTP'ê di civînê de li ser Rewşa Rêberê Gelê Kurd û gera "Vîna Azad û çareseriya demokratîk" niqaş meşandin.

Cîgira Hevserokên DTP'ê Aysel Tugluk, têkildari civînê û bernameyê axivî û diyar kir ku di 5'ê kanûnê de dest bi pêvajoyê dikin. Tugluk, anî ziman ku Hikûmeta AKP'ê dest bi hewldana tasfiyeyê kirine û ev hewldan ji Ocalan ve dest pê kirine. Tugluk, destnîşan kir ku li ser navê hewldana çareseriyê dest bi perçekirina vîna kurdan û tasfiyekirina hêza kurdan kirine û ev yek ji Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ve dest pê kirine. Tugluk, bal kişand ser mercên Ocalan û wiha got: "Dixwazin Ocalan bê bêhn bihêlin. Ji kurdan û rêxistinên kurdan re dibêjin teslîm bibe û vîna xwe teslîmî me bikin. Dibêjin plana me qebûl bikin. Lê di vê hewildanê de tu demokratîkbûn û çareserî tune. Tasfiye û perçekirin heye. Teslîmiyet heye. Em vê yekê qebûl nakin. Rewş bir cîddî ye divê gelê me vê yekê baş zanibe."

**Daxwaza DTP'ê...**

Tugluk, bal kişand ser hêz û sekna kurdan û wiha dom kir: "Bila tu kez ji me tiştên bêrûmet nexwazin. Em ne koma ehmeqan in. Kesê ku birîndar nebûn, nehatin binçavkirin û girtin neman. Kesên êş nekişandin û bedel nedan neman. Bila hikûmet baş zanibe ku em tenê aştiyek bi rûmet dixwazin."

**Heyetek diçe Başûr**

Her wiha hate zanîn ku heyetek DTP'ê dê di nava 10 rojên pêş me de biçin Herêma Federal a Kurdistanê û têkildarî rewşa wargeha kampa Maxmûrê hevdîtinan çêkin. Hate hînbûn ku heyeta DTP'ê dê di ziyareta Herêma Kurdistan de kampa Maxmûrê jî ziyaret bike. ENQERE

www.arsivakurd.org

## Ji bo roja cejna bêalîtiyê efû!

Di bin serokatiya Serokdewletê Turkmenistanê Gurbanguli Berdîmuhamedov de hikûmetê biryar da ku ji ber cejna bêalîtiyê ya roja 12'ê kanûnê 19 jê biyanî bi giştî 3934 kes bên efûkirin û cejnê li mala xwe derbes bikin. *AŞKABAT*

## Dîktatoran destûr nedan

Di Televîzyona dewleta Hondurasê de hat aşkerakrin ku hikûmeta ku ji aliyê derbeya leşkerî ve hatiye destnîşankirin destûr nedaye ku Serokdewletê Hondurasê Manuel Zalaya vegere ser peywira xwe û dema xwe ya mayî biqedîne. *TEGUCÎGALPA*





# DYA'yê dest bi zextan kir

## Obama ji bo destê xwe yê şer ê li Afganistanê xurt bike dest bi zextan kir da ku NATO leşkeran bişîne û Tirkiyeyê li dijî vê zextê stû tewand û got belê ez dişînim

Serokdewletê Amerîkayê Barack Obama piştî ku stratejiya şer a Afganistanê aşkera kir, ji bo ku welatên endamên NATO'yê jî leşker bişînin Afganistanê, dest bi zextan kir.

Wezîrê Karên Derve yê NATO'yê ligel rayedarên payebilind ên Amerîkayê li Brukselê civîn çêdikin. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) ji mutefîkên xwe yên endamên NATO'yê dixwaze ku hê pirtir leşker bişînin Afganistanê. Lê welatên Ewropayê bêdil nêzîkî vê daxwazê dibin.

**Qaşo ji bo 'vekişînê' dişîne**

Obama roja sêşemê diyar kir ku DYA ji bo şerê Afganistanê 30 hezar leşkerên din dişîne û hewl dide ku piştî sal û nîvê jî dest bi vekişînê bike.

Rayêdarên payebilind ên Amermîkayê jî dest bi liv û lebatê kirin da ku stratejiya hate aşkerakirin bi siyasetmedarê amerîkî bidin qebûlkirin.

Serfermandarê Giştî yê DYA'yê Orgeneral Mîke Mullen ji bo komîteya leşkerî ya Senetoya DYA'yê axivî. Mullen Diyar kir ku biryara DYA'yê ya şandina 30 hezar leşkerî dê pêşî li Talîbanê bigire da ku felaketên mezin neyên serê Afganistanê.

Fermandarê amerîkî Stanley McChyrstal ku serfermandarê giştî yê hemû hêzên biyanî yên Afganistanê ye got ku bi vê teqwiyeya nû ew dê heta salekê encameke baş bi dest bixin.

**Ji bo vekişînê bertek**

Namzetê berê yê Komarparêz Senator John McCaîn ji ber daxuyaniya Obama ya 'heta sal û nîvekê em ê dest bi vekişîna ji Afganistanê bikin' rexne kir û got bi vê daxuyaniyê hêviya neyar (Talîban) xurt kiriye.

Nînerê Obama yê Afganistan û Pakistanê yê Taybet Richard Holbrooke jî vê îdiayê red kir û got ev daxuyanî ji bo raya giştî ya navxweyî ya Amerîkayê hatiye kirin.

Holbrooke destnîşan kir ku gelê amerîkî naxwaze leşker demdirêj li Afganistanê bimînin. Stratejiya esasî ev e ku polîs û leşkerên afganî perwerde bikin û berpirsiyariya ewlehiyê bidin wan.

Talîbanê jî bi daxuyaniyekê diyar kir ku ev plan bi kêrî tiştekî nayê û tenê dê windahiyên leşkerên biyaniyanî yên dagirkeran zêde bike.

**Plana nû ya Obama**

Teqwiyeya nû heta nîvê sala 2010'an dê temam bibe. Piştî teqwiye temam bibe hejmara leşkerên DYA'yê yên li Afganistanê digihîje 100 hezarî.

Obama bang li welatên endamên NATO'yê kir da ku ew jî teqwiye leşker bişînin da ku li dijî Talîbanê şer bikin.

Obama rexneya ku Afganistan dê bibe Vietnam red kir. Vegot ku ew li Afganistanê şerê ewlehiya cîhanê didin û xwest mutefîk jî bi vê hişmendiyê leşkeran bişînin.

Fermandarê Giştî yê Hêzên Biyanî yê Afganistanê Orgeneral Stanley McChrystal ji ber biryara Obama bextewariya xwe diyar kir. McChrystal destnîşan kir ku peywireke diyarde ye û ji bo peywirê jî çavkaniyên pêwîst dikin, hatiye dayîn.

McChrystal li Qabîlê daxuyanî da. Diyar kir ku ew dê bi hatina van 30 hezar leşkerî bi Talîban bide famkirin ku ew dê bi şer bi ser nekeve. Pisporan li ser vê diyar kir ku armanca DYA'ye ne ew e ku bi vê teqwiyeyê di şer de bi ser bikeve, armanca wê ev e ku Talîbanê bikişîne asta diyalogê. **QABÎL**



## Civîna NATO'yê dest pê kir

***WEZÎRÊ*** **Karên Derve yê NATO'yê ji bo Afganistanê binirxînin doh dest bi civîna du rojan kir. Wezîra Karên Derve ya Devletên Yekbûyê yê Amerîkayê (DYA) Hillary Clinton ber ya ku civîn dest pê bike daxwaza xwe ya ji civînê aşkera kir. Clintonê xwest ku mutefîk piştgiriya bidin lê hejmara leşkeran diyar nekir. Dîplomatan hejmarê jî diyar kirin û gotin bi kêmanî 10 hezar leşker divê bên şandin. Clintonê ligel piştgiriya leşkerî piştgiriya malî jî daxwaz kir.**

## Bazara tirkan li ser PKK'ê ye

Beriya ku Serokwezîrê Tirk Recep Tayîp Erdogan roja 7'ê kanûnê bi Serokdewletê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) Barack Obama re hevdîtin bike di navbera her du welatan de bazara qirêj derket holê. DYA'yê ji Tirkiyeyê ji bo ku bişîne Afganistanê û li dijî Talîbanê şer bike leşker xwest. Tirkiyeyê jî di berdêla vê de ji DYA'yê dixwaze di şerê li dijî PKK'ê de destek bide wê.

DYA jixwe li Afganistanê her diçe ber bi têkçûnê ve diçe. Li Iraqê jî rewşa Amerîkayê ji ber têkçûnê li ber vekişînê ye. Ligel vê Talîban li Afganistanê xurt dibe û li 11 eyaletên Afganistanê desthilatiya xwe heye. DYA ji bo ku navê têkçûneke din a wek Vîetnamê li rûpelên dîroka xwe nenivîse biryar da ku 30 hezar leşkerên din bişîne şerê Afganistanê. DYA zext li mutefîkên xwe dike da ku leşker bişînin. Pirtirên welatên NATO'yê stû li ber vê zextê natewînin. Lê Tirkiye ji bo ku li dijî PKK'ê piştgiriya DYA'yê bigire dixuye ku stû tewandiye.

Wezîrê Parastina Tirkiyeyê Vecdî Gonul jî beriya ku Erdogan biçe serdana DYA'yê diyar kir ku ew dê leşker bişînin. Lê bi şertê ku leşkerên wan neçin li başûr û rojhilatê Afganistanê nekevin nav şerê germ.

Daxwaza DYA'yê ji bo teqwiyeya muharîb e. Ango ji bo ku di nav şerê germ de cih bigirin leşker dixwaze. Ev dê di nav demeke nêz de bi taybetî di serdana Erdogan a DYA'yê de diyar bibe.

Hevdîtina Erdogan û Obama roja 7'ê kanûnê li DYA'yê li Qesra Spî pêk tê.

Her wiha di çapameniya tirk de hat aşkerakirin ku komîsyoneke sêalî ku ji nûnerên tirk, amerîkî û iraqî pêk tê dê biçe kampa Maxmûrê da ku penaberên kurd ji bo vegerê aşt bikin. Ev jî kûrbûna hevkariya dîplomasiya di navbera Tirkiye û DYA'yê de destnîşan dike. **AMED**

## Krîza Holanda û Tirkiyeyê

Delegasyona Parlamentoya Holandayê serdana xwe ya Tirkiyeyê ya meha çileya 2010'an betal kir. Wekî sedema biryara betalkirinê jî helwesta Tirkiyeyê ya pêşwazînekirina heyetê hat nîşandan. Tirkiye ji ber ku Serokê Partiya Azad (PVV) Geert Wîlders di nav delegasyonê de cih digire diyar kir ku delegasyonê pêşwazî nakin. Wîlders bi polîtîkayên dijberiya Tirkiyeyê tê nasîn.

Serokê Komîsyona Karûbarên Ewropayê ya Parlamentoya Holandayê Harm Evert Waalkens li ser mijarê daxuyanî da. Di daxuyaniyê de got ku ji bo diyarkirina endamên komîsyonê Parlamentoya Hollandayê berpirs e. Waalkens da zanîn ku Tirkiye der barê mijarê de ne xwedî maf e. Waalkens vegot ku wan ligel hev biryara serdana Tirkiyeyê girtiye û ligel hev jî biryara betalkirina serdana Tirkiyeyê dane. **DEN HAAG**

## Li Almanyayê çeteyên tirk

Çeteyên tirk ku li bajarê Kolna Almanyayê li dijî karsaz û karbidestên kurd ketine nava êrîşkariyan û di encamê de hatin girtin, derketin pêşberî dadgehê.

Ji çeteyên tirk, 5 kes di dadgeha Eyaleta Kolnê de ji ber sûcên ruşwet, zext û zor, xesp û revandina mirovan têne dadgehkirin.

Dozger got ku tenê 5 kes di navbera 39 û 60'î de tê guhertin û di sala 2008'an de dest bi çetegeriyê kirine û got: "Rêxistina krîmînal ya kontrayî pêkanîne. Çek bi kar anîne û bi navê mîlîsên neteweyî yên Ewropa kar kirine." Dozgeriyê da zanîn ku çetegeran sûcên xwe îtîraf kirine û vegot: "Çeteyên tirk, ji bilî karsaz û karbidestên kurd, plan êrîşkirin, revandina PKK'iyan jî amade kirine. Lê bêtir di aliyê xespê de bi pêş ketine û bi tehtîd û şantajan pere standine. Di îdianamê de jî tê gotin ku gelek PKK'î kirine bin şopandinê û planê revandina wan amade kirine. Ji sedema ku polîsên Almanyayê çete girtine, kurdistanî ji revandin û kuştina çeteyan xelas bûne. **KOLN**

## Qerebax û protokol ne têkilî hev in

Her ku hewldanên çareserkirina pirsgirêka Qerebaxê didome, nîqaşên li ser erêkirina protokolmên Tirkiye-Ermenistanê jî tên nîqaşkirin.

Li ser mijarê Cîgirê Wezîrê Karên Derve yê AKP'ê Suat Kinikoglu got: "Ji bo protokol li Parlamentoya Tirkiyeyê were erêkirin divê Ermenistan ji 7 herêmên Azerbaycanê vekişe." Lê Serşêwirmendê Serokomarê Ermenistanê Vîgen Sargisyan got: "Me meha çile wekî dem diyar kir. Heke heta meha çileyê biryarek dernekeve, ji sedemên siyasî ev pêvajo dikare xira bibe." Li Brukselê panelek ji aliyê German Marshall Fund ve hate çêkirin, bi navê "Tirkiye û Ermenistan: Riya Pêşveçûnê". Suat Kinikoglu û Vîgen Sargisyan jî beşdarî vê panelê bûn.

Suat Kinikoglu di panelê de anî ziman ku normalîzekirina têkiliyên tirk û ermeniyan dê bike ku hemû Başûrê Qafqasyayê bikaribe xwe biguhere û wiha axivî: "Ne li gor aqil û mentiqê ye ku li devereke herêma Qafqasyayê mirov normalîzekirinê bixwaze, lê li cihekî kêleka wê bixwaze pirsgirêk bidomin." Der barê protokolê de jî Kinikoglu got: "Ji bo protokol li Parlamentoya Tirkiyeyê were erêkirin divê Ermenistan ji 7 herêmên Azerbaycanê vekişe."

Piştî gotina Vîgen Sargisyan a "herî dereng heta meha sibatê gerek protokol bên erêkirin", Kinikoglu jî got: "Çewt e ku mirov salnameyeke sûnî dayne holê. Dema mirov salnameyên wiha çêkirî dayne, dê zerarê bidê."

**Bila kes me bi kar neyne**

Vîgen Sargîsyan jî anî ziman ku Tirkiye bixwaze protokolan îmze bike, divê pirsgirêka Qerebaxa Jorîn û Azerbaycanê têkilî vê mijarê neke û wiha axivî: "Ev protokol mijara Qerebaxa Jorîn nahundirînin. Her wisa, Ermenistan ne amade ye ku bi du welatan re bi hev re muzakereyan bike. Di pêşiya me de astengiyên demê jî hene û giring in. Me meha çileyê wekî maweyekê diyar kir. Heke heta meha çileyê biryarek dernekeve, ji sedemên siyasî ev pêvajo dikare xira bibe.



Piştî protokol hat morkirin tişt nehatiye kirin.

**Qerebax ne di nav de ye**

Helbet dema mirov behsa normalîzekirinê dike, bila wisa neyê famkirin ku di êvarekê de em ê ji nişkê ve bibin birayên hev. Em hez dikin ku sînor vebin û di navbera her du welatan de diyalogên dîplomatîk dest pê bikin. An em ê mijara Qerebaxê têkildar nekin û vê diyalogê bidomînin, an jî em ê dawiyê lê bînin. Em naxwazin kes me ji bo siyaseteke din bi kar bîne." **BRUKSEL**

## Biryara Îranê bêtir tûj dibe

Îran helwesta xwe ya li ser nukleerê û bernameya uranyumê berfirehtir kir. Li ser mijarê Serokomarê Îranê Mehmûd Ehmedînejad helwesta xwe ya ji bo nukleerê û bernameya uranyumê got ku ji vir û şûn ve dê Îran rêjeya dereceya dewlemendkirina uranyumê zêdetir bike.

Ehmedînejad li bajarê Îsfahanê diyar kir ku ji bi bo sotemeniya nukleerî uranyuma bi kar bîne di rêjeya ji sedî 20 hilberîna uranyuma dewlemendkirî bike.

Pisporên mijarê didin zanîn ku çiqas rêjeya dewlemendkirina uranyumê zêde bibe ji bo çêkirina çeka nukeerî bi derfet dibe. Ancax der barê bernameya nukleerî de Îran bi Neteweyên Yekbûyî ve girêdayî ye û payedarên Îranê didin zanîn ku berovajiyê fikarên DYA û Îngilistanê armanceke wan a hilberandina çeka nûkleerî nîn e. Ji bo armanca enerjiya sivîl dewlemendkirina ji sedî 3'yê uranyumê têr dike. Ji bo çeka nukeerî jî divê uranyum ji sedî 90 bê dewlemendkirin. **TEHRAN**

www.arsivakurd.org




# Dê çalakiyên xwe bidomînin

**Jinên kurd ji bo şermezarkirina tecrîda ser Abdullah Ocalan ketin nav hewldanan. Jinên kurdistanî yên li Ewropayê dijîn CPT û DMME hişyar kirin û gotin ku ev lîstîka xapandinê ye**

Tevgera Jinan a Ewropayê der barê rewşa Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de jinan bal kişand ser rewşa Ocalan û diyar kir ku ew ji rewşa tenduristiya Ocalan bifikar in.

Di daxuyaniyê de hate gotin ku Girtîgeha F a ji hêla CPT'ê ve hatî avakirin tenê xapandinek e. Jinan got ku divê CPT û Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) bi vê munasebetê bikevin nav hewldanan û heyetekê bişînin Îmraliyê.

**Tecrîd û îzalasyon heye**

Tevgera Jinan a Ewropayê, di daxuyaniyê de da zanîn ku derfetên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan her diçe tê girankirin û ew wekî jinên Kurdistanî bifikar in û wiha daxuyaniya xwe domandin: "Piştî ku neqla wî li girtîgeheke din hate kirin derfetên wî bêtir hatin girankirin. Ev girtîgeh ji hêla CPT'ê ve hate avakirin. Bi vê girtîgehê Ocalan terkî mirinê dikin. Ocalan 11 sal in girtî ye û di 13 metrekareyî de jiyana xwe didomand. Ocalan di bin şertên giran, tecrîd û îzalosyonê de dijî. 11 sal in televîzyonek nehate dayîn, mafê telefonê bi kar neanîn û ji serlêdanan mehrûm hate hiştin. Ji ber hevdîtinan gelek caran di nav tecrîdê de rastî cezayê tecrîdê hat. Her wiha ji ber giravê jî bêtir rewşa wî ya tenduristiyê xirab bû. Piştî 10 salan CPT çû serdana Ocalan û biryar da ku divê şert û mercên Ocalan bên guhertin û raporek pêşkêşî Tirkiyeyê kir. Bi projeya CPT'ê girtîgeha F hate avakirin. Ev guhertina şert û mercan bi riya çapemeniyê hate aşkerakirin."

**Wî terkî mirê dikin**

Tevgera Jinan di daxuyaniyê de destnîşan kir ku ev tenê derew û xapandinek bû ji ber ku şert û mercên Ocalan bi girtîgeha F'yê bêtir hatin girankirin. Di daxuyaniyê de hate gotin ku berê Ocalan di 13 metrekareyî de jiyana xwe dom dikir, lê niha jî di 6 metrekareyî de dijî. Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku CPT û DMME bi vê rêbazê daxwaz dikin ku Ocalanê terkî mirinê bikin.

**Divê her kes hişyar be**

Tevgera Jinan a Ewropayê, daxuyand ku ev CPT û DMME hîşyar dikin û daxuyaniya xwe wiha berdewam kir: "Divê CPT heyetek bişînê Îmraliyê. Şert û mercên jiyanê bên sererastkirin û Ocalan bê tedawîkirin. Her wiha heta ku daxwazên me neyên qebûl kirin çalakiyên mê dê bidomin. Di serî de jin, gelê kurd, rêxistinên mafên mirovan, dezgehên sivîl, dezgehên çapemeniyê û raya giştî di vê mijarê de hişyar bin û helwestên xwe nîşan bidin." BRUKSEL

# Jinên sosyalîst xwe birêxistin dikin

RUKEN ADALI - STENBOL

Nivîskar Mukaddes Erdogdu Çelîk ku di xebatên avakirina Meclîsa Jinan a Sosyalîst de cih digire, got ku çawa pergal jinbûnê nîşanî civakê dike wisa jî mêrbûnê nîşanî civakê dike. Erdogdu Çelîk, da zanîn ku li dijî jinbûn û mêrbûna di nav civakê de hatî fêmkirin têkoşîneke hevpar didin.

Berdevka Meclîsa Jinan a Sosyalîst Çelîk, da zanîn ku amadekariyên avakirinê hêj dom dikin. Çelîk, destnîşan kir ku armanca meclîsê pêkanîna şoreşa jinê ye û wiha axaftina xwe dom kir: "Di rojên borî de Muteşebîsa Partiya Sosyalîst a Bindest damezirandina xwe îlan kir. Piştî damezirandinê, jinan jî avakirina Meclîsa Jinan a Sosyalîst îlan kir. Em armanc dikin ku têkoşîna jinan bilind bikin. Di nav xebatan de dê li dijî fêrbûna mêrantiyê ya di nav civakê de têbikoşin."

Erdogdu Çelîk, di axaftina xwe de bal kişand ser rêxistinbûna jinan a xwaser û diyar kir ku ji bilî DTP'ê, partiyên siyasî wekî bask xwe bi rêxistin kirine. Çelîk, got ku dê wekî meclîsê xwe di nav partiyê de bi rêxistin bikin. Li gorî Çelîk êdî rêxistinbûna bask terê nake û xebatên jinan wekî parçeyên xebatên din tê dîtin û wiha axivî: "Ji bo vîna jinê û mejiyeke kollektîf meclîs girîngin. Meclîs di nav partiyê de dibe hêzeke mezin, temsîliyeta wekheviyê diparêze û wek partiyek din dê xwe nîşan bide. Di nav partiyê de wekî beşek neyê dîtin. Dê bi wî şeklî jin û mêr wek hev bên temsîlkirin."

Çelîk, daxuyand ku jin dê rojevên xwe aşkera bike û li ser nîqaş bike piştre jî tevlî civînên giştî bibe û her wiha partî jî hemû biryarên ku dide temsîliyeta jinê esas bigire.

**Rêxistinbûna kurdan mînak e**

Çelîk, di axaftina xwe de bal kişan ser rêxistinbûyîn, tecrûbe û pratîkên Tevgera Jinên Kurd û got ku modela rêxistinbûna jinên kurd berfirehe. Çelîk, da zanîn ku jinên kurd ne tenê wekî meclîs, wekî partî û arteş xwe bi rêxistin kirine.

Çelîk, got ku dê bi meclîsan tevgera jinên sosyalîst pêş bixin, rêxistinbûna xwe xurt bikin, di afirandina polîtîkayan de roleke sereke bilîzin, di çapemeniya partiyê de cih bigirin û fikr û ramanên xwe binin ziman.

Çelîk, daxuyand ku dê têkoşîna xwe bêtir bilind bikin û bi jinên din re helwestên hev par nîşan bidin û her wiha dê li dijî fêrbûna mêrbûnê ya di nav civakê de jî têkoşîneke hev par bidin meşandin.

# Bîranîn



Müfit EK
1970-Farqin
01.12.1993 Farqîn

*Li avê dinêrim*
*Ava hêşîn a çemekî...*
*Bi pêlên gerê diherike û diçe*
*Lê dibêjim,*
*Divê çavên min,*
*Destê min lê bikevin*
*Ava ji min dûr dikeve*
*Dûr dibe û diçe*
*Xwe veneşêre...*
*Ji çavên bi hêvî veneşêre...*

**Diya wî Dilşah, bira û xwişkên wî**
**Murat, Hesen, M. Emîn, Emîne, Medîne, Amîne, Muhsîne, Herdem, Menfia û Canan**

# Kujerên wê hatin girtin

Li Edeneyê jina ku ev demeke dirêj bû winda bû kuştî hate dîtin. Cesedê wê li ber Santrala Hîdroelektrîkê ya ÇEAŞ'ê ya li ber bendava Seyhanê hate dîtin. Jina bi navê Tugçe Anlaş (20) ji bo çûna sînemayê ji mal derketibû. Piştî ku ji mal derket êdî tu agahî jê nehate standin. Tugçe Anlaş bi 20 derbeyên kêran hatiye birîndarkirin û serê wê hatiye jêkirin. Ji bo otopsiyê cesedê wê rakirin Dezgeha Tiba Edlî ya Edeneyê. Lêpirsinek der barê bûyerê de hate destpêkirin û 2 kes hatin binçavkirin. Li gorî agahiyan Anlaş ji hêla hezkiriyê xwe yê17 salî M.E. ku nû ji girtîgehê derketiye vê hatiye kuştin. A.P jî ji ber ku alîkarî daye wî, hate girtin. EDENE

# Li Başûr şîdet berdewam e!

Li başûrê Kurdistanê li sînorê her çar qezayên Soran, Rewandiz, Çoman û Mêrgesor, di 11 mehên derbasbûyî de 132 jin rastî şîdetê hatine. Hate diyarkirin ku di 11 mehên derbasbûyî de li sînorên qezayên wekî Soran, Rewandiz, Çoman û Mêrgesorê 132 bûyerên şîdetê pêk hatine. Li gorî agahiyan 48 işkence, 17 şewat, kuştinek û 5 tecawiz pêk hatine. Ev agahiyên fermî ni ku hatine bi destxistin. Lê hejmar her diçe zêde dibe. HEWLÊR

**NÛCAN DÊRÎK**

# Rêhevaltiya jinan

Civaka xwezayî ya ku tu carî nehatiye qedandin di mejiyê mirovahiyê de kîjan demê dibe bila bibe, wê rojekê derkeve ser rûyê cîhanê û xwe bi hemû xweşikbûna xwe re bijî.

Dayika ku di rahma xwe de daye mezin kirin û bûye afrînêra hemû rengên pîroz, keda xwe bi exlaqê civakê re dike yek. Bi parastina civaka xwe vê yekê pêk tîne. Ev yek hiştiye ku dayik di hemû afirandinê xwe de bibe pêşengê demê û xwe wek parçeyekî vê xwezayê bide îfade kirin. Ji ber ku hestiyariya dayik li hemberî civakê û di heman demê de dostaniya wê li hemberî xwezayê dihişt ku bibe xwedavenda kedê û hemû tiştî bi keda destê xwe biafirîne wekî jana ku zarokekî tîne cîhanê, ewqasî keda xwe hembêz dike. Di civakê de wate dayîna hemû xala li cem jinê dibe wekî feraseta ku pêwîste ev wate dayin hebe. Jina ku hemû mirovahî di rehma xwede daye mezin kirin her rojekî pergala zilamê hovane ku li ser ked û pişta jinê û civaka ku bi rengê daye avakirin xwe li ser wê dike padîşah û hemû xweşikbûnê ku jin daye afirandin, lewra civaka jin ya ku ti cûdahî ne xistiye navbera tu zayenda û xweza beşek ji xwe didît, ji bo berjewendiyên pergala xwe jina ku ji hemû civakê re nûnerî dikir xist asta herî biçûk.

Pergala zilamê hovanê ji bo xwe mezin û wekî canavarekî dijî bi zihniyeta ku dibeje mejiyê jinê kême an jî, jin jî parsûyê zilam hatiye afirandin, jinê biçûk dike û xwe li ser bingeha biçûkbûna û çewsandinê jinê di afirîne. Di encam de ev feraset û nêzîkatî bi hemû xwezayere daye rûniştandin û pêşxistin. Di hindirê xwe de ti nêzîkatiyekî mirovahî ne hewandiye. Lewra her çiqasî hewldanên jinê dem dem pêk hatibe jî dîsa demga xwe li dîrokî xistiye. Ji ber ku pergala zilamê hovane li dijî jinê hemû dibe yek, ji ber ku feraseta zilam ya li gorî axaftinê ya efendiyê. Jinê ji hemû zanebûn qut bî dest digire. Jin di her alî de bê dîrok hatiye hiştin.

Rêber Apo dema ku civak û pergalê digre dest û analîz dike, hemû dane û kirpandinên dîrokî bi dest digre bi hevdûre dinirxîne û dighîne sentezekî nû. Zayenda jinê bi vîn û hemû dewlemdiyê wê, bi hemû rastiyê ve derdixe rûyê rojê û bi civaka wê ya xwezayîre cardin yek dike. Jinê li gorî rastiya wê cardin radike ser piya. Bi gotina; " Dîroka ketîbûna jinê hatiye nivîsandin lê dîroka azadiyê ne hatiye nivîsandin" bi kedekî mezin bi hêrsekî bê dawî, jin ji nava pergalê girt dest û xwest pergala jin ava bike û pêşengetiya pergalê bike, xwest jinê wekî mirovekî xwedî raman, xwedî birdozî, feslefeya jiyanê be.

Bi taybet li gorî vê rastiya jinê rastiya civakê bi dest digire û berbi pergala polîtîk û exlaqî ve dere. Rêbertiya me jin nas kir û hîs kir. Lewra dibêje bi azadiya jinê re azadiya civakê wê were çêkirin û wê hemû pencesêra pergalê bi vî rengî ji holê were rakirin. Hevaltiya herî mezin bi jinê re dike.

Ji ber vê yekê ye ku pergala desthilatdar û hovane li dijî Rêbertî bi kîn û nefreteke herî mezin bi ser de diçe. Jina ku dîroka wê bi destê wê nayê nivîsandin bi Rêberiya Rêber Apo dibe xwedî vîna herî mezin ku ew bi xwe jiyana xwe ya azad diafirîne. Lewra me di civaka xwezayî de hemû reng û dewlemendiya xwe dida hemû xwezayê di şerê îro de jî, ji bo ku dîroka azadiya jinê ji nûve bê nivîsandin û avakirin, civaka polîtîk û ehlaqî bê afirandin pêwîste. Ev yek ê bihêle ku em li hemberî pergala desthilatdar bibin xwedî vîna wê rastiya herî bi qirêj derbas bikin.

Hevalbendiya xwe ya bi Rêberê xwe re li ser bingehî xeta Zîlan, Viyan, Bêrîtan, Nûda û hemû nirxên xwe yên giranbiha cardin û cardin ronî bikin. Di van mehên herî hesas de bi biryarê bi ser hemû zor û zehmetiyan de herin. Ev dibe hevalbendiya rast ye demê û mîlîtanên jinên azad.

# ‘Gel dijberiya li dijî vîna xwe qebûl nake’

## Murat Karayilan, dijwarkirina şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, wekî mercên cidî yên şer bi nav kir û got, Rêber Apo ji bo gelê kurd nasname ye û pêwîst e gelê kurd vê li rûmet û şerefê xwedî derkevê

Serokê Konseya Rêveber a KCK’ê Murat Karayilan destnîşan kir ku, gelê kurd bi însiyatîfa xwe dijberiya xwe nîşan dide û got: “Gelê me xwedî îrade û însiyatîf e. Senaryoyên tasfiyekirina PKK’ê jî di rojevê de ne. Lê bila bê zanîn ku kes nikare PKK’e tasfiye bike.”

Karayilan ku ji ajansa ANF’ê re axivî, dijwarkirina rewşa Reberê Gelê Kurd û dijberiya gelê kurd nirxand û got ku, her kes bi awayekî manewî û dilsoz bi Rêber Apo ve girêdayî ye. Her kes xwe berpirsiyar dibîne û êrîşên li dijî Serokatiya xwe qebûl nake.

Karayilan, bal kişand ser gera Serokwezîrê Tirkiyeyê Erdogan ya Amerîkayê û wiha got: “Mîna her serdana xwe, Erdogan di vê serdana xwe ya Amerîkayê de jî, senaryoyên tasfiyekirina PKK’ê wê bike rojevê. Tirkiyeyê, xwe beramberî tafsiye kirina PKK’ê kiriye bazarê, lê PKK tenê ne li Qendîlê ye. Qendîl nebe jî dê PKK hebe. Em di doza xwe de mafdar in û gelê me jî, me destek dike. Erdnîgariya me jî, di aliyê stratejîk de mertalê parastina me ye.”

**‘Divê wê îradeyê qebûl bikin’**

Karayilan der barê rewşa dawî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de, wiha axaftina xwe dirêj kir: “Rêber Apo, cihê xwe yê nû, wekî çala mirinê bi nav kir. Dewleta Tirk jî dibin navê demokratîkbûnê de, pêvajoyek daye destpêkirin, lê maskeya wan ket. Pêwîst e zanibin ku Ocalan ne girtiyekî ji rêze de ye. Li Kurdistanê vînek e. Yên ku Ocalan wek vîna xwe destnîşan kirine jî, gelê kurd e, helbet dijberiya li dijî îradeya xwe qebûl nake. Rêber Apo, serok û pêşengê serîhildana hemdemî ya gelê kurd e.”


Karayilan da zanîn ku gelê kurd, ji damezirandina Komara Tirkiyeyê û heya îro, ji bo mafên xwe yên demokratîk di nava serhildanan de ye û got: “Lê îro, gelê kurd di bin pêşengiya tevgera modern ya Tevgera Azadiya Kurd de, ketiye rojeva Tirkiye û cîhanê. Serokê vê tevgerê jî, Rêber Apo ye û her serhildana gelên cîhanê xwedî serok e. Têkoşîna gelê kurd ya di bin pêşengiya Rêber Apo de dewam dike, pêwîste rayedarên dewleta tirk vê yekê erê bikin.”

Karayilan got: “Pirgsirêkên tenduristiya Rêber Apo, hene. Dewleta Tirk bi zanîn Birêz Ocalan dike çala mirinê. Sîstema Îmraliyê, ji bo têkbirin û tunekirinê ye.”

Karayilan bal kişand rol û mîsyona Erdogan û wiha axivî: “Rola Erdogan, şikandina îradeya gelê kurd e, tasfiyekirina Tevgera Azadiya Kurd e. Ev aşkera bûye. Pêwîst e gelê me, dostên me, eniyên demokrat û kesên aştîxwaz, vê rastiyê bîbînin û bizanin.”

**Tasfiyekirina Tevgera Azadiyê**

Karayilan da zanîn ku AKP’ê, ji bo rondikên dayikan ne rijin û dilê dayikan neşewitê yek gav bi tenê ne avêt û dirêjî da axaftina xwe: “AKP’e ji destpêka demokratîkbûyînê de û heya dawiyê, serî li taktîk û lîstikan dide. Di encamê de, derkete holê ku pêvajoya AKP’ê, tafsiyekirina Tevgerê û şikandina vîna gelê kurd e. Vê yekê di çûna Komên Aştiyê di nîqaşên parlamenê de xwe aşkere kir. Bi taktîk nêzîkî pirsgirêka kurd dibin.”



Karayilan destnîşan kir ku operasyonên leşkerî û sivîl bi dijwarî dewam kirin û wiha got: “Yên ku rondikên çavên dayikan dirîjînin jî operasyon in. Eger operasyon çênebin kuştin jî çênabin. AKP’ê jî, dixwaze zemîna operasyonan ferehtir û dijwartir bike. Fitne û fesadiyê dike, dixwaze ku birakujiyê bike navbera kurdan. AKP’ê berdewama desthilatdariyên berî xwe ye. Tansu Çîller jî ji derve piştgirî distand, Erdogan jî ji Amerîkayê piştgirî distîne. Ew jî bi îdiayên mezin derketin pêş, Erdogan jî, lê aqibeta yên berê bû çi, ya Erdogan jî wê bibe ew. Gelê kurd her dem rûmet û şerefa xwe parastiye.”

**Qendîl nebe jî PKK heye**

Serokê Konseya Rêvebir a KCK’ê Murat Karayilan got ku, pêwiste baş bê zanîn ku PKK ne li Qendîlê bi tenê ye, Qendîl nebe jî wê PKK hebe, xala duyemîn jî, gelê Maxmurê ye û gelê Maxmurê, ne basît û arzan e, xwedî dîrokeke berxwedêr ya bi rûmet e. Li dijî zordestiya artêşa Tirk koçber bûne û bêrûmetî erê nekirine, li Maxmurê jî, li cihekî qelaç bû, lê cîhaneke bi rûmet ava kirin. Desthilatdariya AKP’ê, hîna bangên bêrûmetkirinê dike. Bila bê zanîn ku gelê kurd her dem û dibin her cûre mercan de, şerefa xwe û rûmeta xwe parastiye.

**Rola hêzên navneteweyî**

Karayilan destnîşan kir ku di rewşa îro ya rêber Apo de, CPT’î û dadgeha Mafên Mirovan a Ewropa jî xwedî par e û wiha daxuyand: “Berpisiyarê vê rewşê, ne tenê dewleta Tirkiyê ye, xwediyê vê siyasetê hêzên navneteweyî ne. Amerîka û Yekîtiya Ewropa jî berpirsiyar in, lewra em ji CPT’ê dixwazin ku biçê Îmraliyê û rewşê sererast bike. Cihê ku hatiye çêkirin, rekiha mirinê ye. Rekiha ku destûra nefedayin û standinê nadê ye. Ji bo tenduristiyê ne baş e. CPT’ê jî, rewşa tenduristiya serokatiya me baş dizane. Eger tiştek bibe, berpirsyar CPT’ê ye. Dewletên li pey CPT’ê ne. Pêwiste rojekê ber rojekê serokatiya me ji wer debrixin. Ne çareseriya pirsgirêka kurd jî wekî webalekî di stuyê Amerîka de ye. Amerîka, sazkarê komployan û destekvanê terora dewleta Tirkiyê ye.”

**Sûriye gavên paş avêt**

Murat Karayilan, bal kişand ser greva birçibûna li girtîgeha Edra û wiha got: “Serokê dewleta Suriye di destpêkê de got ku ewê gavên demokratîk biavêje, lê mixabin paşde gav avêt. Li girtîgehên Suriye pergala êşkencê dijwartir kir. Dibin pêşengiya girtiyên PKK û PYD’ê de têkoşîneke dîrokî dest pê kiriye. Ev têkoşîn kete roja 34’an. Yekem car e ku têkoşîneke wiha, li Suriyeyê tê lidarxistin. Ev temsîliya gelên li Suriye ye û dîrokî ye. Berdewama xeta Mazlum Dogan, Kemal Pir, Hayrî Durmuşan ya di zindanên Suriye de ye. Pêwiste gelê me li wan xwedî derbiekvê. Piranî gelê me yê li başûrê rojava, sazî û dezgehên demokratîk û gelê me yê li Ewropa, xwedî derketineke bi hêz û çalak destnîşan bikin.”

**‘Girtiyan serbest berdin’**

Karayilan bang li dewleta Suriye jî kir ku daxwazên girtiyên azadiyê li ber çavan bigire, zext û zora li girtîgehan jî bidê rawestandin û dirêjî da axaftina xwe: “Pêwiste desthilatdariya Suriyeyê, şaşiyan neke, kes bi zext û zora li ser girtiyên azadiyê tu encaman bidestnaxe. Têkiliya gelê kurd û dewleta Suriye, dostaniyeke qedim heye. Bi kiryarên desthilatdariya îro ya Suriye ev têkilî sar bûne. Eger Suriye dixwaze ku têkiliya kurdan û dewleta Suriye xweş bibe, bila zext û zor a li ser gelê kurd û ya li ser girtiyên azadiyê terk bike û girtiyên azadiyê serbest berde.”

**Bê têkoşînê maf nayên standin**

Karayilan herî dawî, bang li ciwan û jinên kurd kir ku di vê pêvajoya ku jiyana serokatiyê ket bin telûkeyê de, dijberiya nîşan bide û wiha dawî anî axaftina xwe: “Ciwanên kurd li metropolên Tirkiyeyê berxwedaneke dîrokî detsnîşan dikin. Pêwiste her Kurdistanî bi heman giyanî tevbigere. Em, ciwanên kurd û her kurdê ku di çalakiya li gel Rêber Apo dikin bi dilsozî silav dikin û dibêjin, bê berxwedan û têkoşîn, tu gelî mafên xwe yê azadiyê bidestnexistiye.” **BEHDÎNAN (ANF)**



Mamoste Silêman
mamoste.suleyeman@hotmail.com

# Vêjdanê merdimanî û sîlehe

Ez bi xo, sîlehe ra qet hes nêkena. Hetta ra-ray ez vana, eke destê mi de selahîyet bibîynî, mi dinya de, heme sîlehe arêdaynî û fabriqeyî silehe zî padaynî (qefilnaynî). Goreyê mi sîlehe, yew çîydo zaf bê luzum o. Sebebê ey zî, çunku, pey sîlehe merdimî mirenî. Bê pawitiş û mucadeleyê azadî, sîlehe şuxûlnayiş yew cînayet o. Yanî sîlehe semedê kiştişê merdiman îcad bîya û pey merdimî mirenî. Pey sîlehe tena merdimî nêmirenî, heywanî mirenî, tebîet texrîb beno, bi sîlehe merdimî, hem ganê xo ra, hem zî malê xo ra benî.

Ewta de ez wazena ke, Tirkâ de û dinya de rewşa (halê) sîlehe û tesîrê sîlehe ser o vindera.

Dinya de, epey pere sîlehe rê xerc beno, Goreyê Enstîtuyê Cigêreyişê Aşîtî yê Stockholmê, serre 2008 de, 1 trîlyon 464 mîlyar dolar eskerîya rê xerc bîyo. Dinya de, sîvîlî zî sîlehan gênî. Eyro dinya de 875 mîlyon sîlehanî adirê ra 650 mîlyon sîlehe, ê sîvîlan a. Dinya de sereyê yew merdimî rê zî 217 dolar pere, sîlehe rê xerc beno. Dinya de, veyşaney ra her serre, bi mîlyonan merdimî heyatê xo vînî (vîndî) kenî. Eke pereyo ke sîlehe rê xerc beno, se de yewê ey veyşaney rê xerc bibîynî, dinya de veşaney nêmendnî. Dinya de, yew mîlyar merdimî roje de pey yew dolar îdareyê xo kenî. Fonê Pereyê Mîyandewletan (ÎMF), qet behsê nêgirewtişê silehan nêkeno, feqet wexto ke, deyn dano sewbîna dewletan, budçeya înan kontrol keno, hetta tesbît kerdişê meaşanî karkeran û memûran ser o vindeno. Semedo ke meaşê karkeran û memûran kemî bidîyo, muzakereyan keno. Ewta de bellî yo ke, ÎMF organîzeyê dewletanî zengînan (dewlemendan) o. Xora dewletê zengînî, sîlehe îxrac kenî û sîlehe ra epey pere qezenc kenî. Dewletê feqîrê (xizanî) zî sîlehe îthalat kenî. Yanî dinya de, çend ceng bibo û sîlehe biroşîyo, şîrketî (tekelî) sîlehanî nê dewletanî zengînan pere qezenc kenî û dewlemend benî, şarî dewletanî bînan zî xizan benî.

Tirkîya de, her serre, pancês mîlyar dolar, yanî budçeya Tirkîya ra sebê sîlehanê eskerîya rê xerc beno. Nê peran mîyan de, meaşê qorûcîyan, xerckerdişo nimitin (ortulu odenek), budçeya asayişê qeraxan (sahîlan) tede nîya. Tirkîya de 800 hezar esker esto. Sîlehe rê, en zaf pere xerc kerdiş de Tirkîya, des dewletan mîyan de ca gêna. Yewna het de, butçe ra pereyo ke eskerîya rê cîya beno, qontrol û teftîş rê akerde nîyo. Îhaleyê girewtişê sîlehe de, zaf yew zelaley çin a. Tirkîya de, nizdîyê hîrê mîlyonî merdimî bêkar î. Vanî ke; “Nê hîris serran mîyan de, welatê kurdan de, çar sey mîlyar dolar, eskerîya û operasyonanî eskerî rê yew pere xerc bîyo.” Xora vayeya gonîya ciwanan nîyna hesabnayiş. Welate kurdande, ridê (semedê) polîtîkaya înkar îmhayê ra tam yew dram ciwîyêno. Sankî na bes nîya, pereyê nê sîlehanê nê cengê, rayna şaranî Tirkîya ra vejîyêno. No dewr de, sîlehe rê inahewa yew pere xerc kerdiş îmha û înkar de israr kerdiş, yew gureyê aqilî nîyo. Dewleta Tirkîya, bi na polîtîkaya xo, bivir (balte) dana linga xo ro. Tirkîya de, karker, memûr, esnaf, citêr, senatkar hetê îdare (ekonomî) ra, her roj tepa şonî. Tirkîya de, kar û gureyê karsazan zî baş nêşono. Na zî heme kes zano ke, yatirim û sermaye, her hewa ra îstîqrar wazeno. Semedê cengê ra, Tirkîya de, qrîzî ekonomî, verra şono xorîn beno. Inahewa şêro ko Tirkîya de problemê sosyalî bivejîyî.

Herb (ceng) zî û aşîtî zî mezg (beyn) de dest pêkena. Merdimanî, kulturê sîlehe ra, kîn û nefret û ceng ra zaf zerar dîyo. Semedê halkerdişê meseleyan de; vernîya merdimanî de, di rayîrî est î. Yew rayîr de; kîn est o, bê edaltey esta, ceng û şîddet est o, vengê sîlehan û bîya barûtê esta, hêsrê çiman û hezn esto. No rayîr tarî yo, tede esla roşney çin a. Rayîro dîyin de; aqil û vêjdan merdimanî hakim o, heq edalet û demokrasî esto, azadî (serbestey) û aşîtî esta. Rayîro dîyin de heme kes bi rengê xo, bi veng û nasnameyê xo esto.



*Dewletî pereyanê ke danê sîlehan, eg qabê şaranê veyşan xerc bikerê se veyşaneya dinyayî holîra yeno wedarneyiş.*

www.arsivakurdi.org

# TEV-ÇAND: Li hemberî wehşetê bêdeng nemînin

**TEV-ÇAND'ê tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kir, li hunermendan banga hîstiyariyê kir û hat gotin ku rewşenbîr wijdana gel in û li hemberî wehşeta Îmraliyê bêdeng nemînin**

Komîteya Çand û Hunerê ya KCK'ê (TEV-ÇAND) tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kir û bang kir ku di serî de hunermendên Kurdistan û Tirkiyeyê yên demokrat û welatparêz li hemberî zilm û wehşeta Îmraliyê bi hîstiyarî tevbigerin û bêdeng nemînin.

TEV-ÇAND'ê ragihand ku wijdana mirovahiyê li hemberî tiştên ku li Îmraliyê diqewimin di azmûnê de derbas dibe û di daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Li Îmraliyê bi çêkirina girtîgeheke nû ve Rêberê me yê neteweyî Abdullah Ocalan neqlî vê girtîgehê kirin û hîn girtiyên din birin giravê. Dewleta tirk ev wekî tiştê ku li hemberî rewşa serokatiya me tiştên baş kiriye ragihand. Lê rastî ne ew e. Girava Îmraliyê ji xwe tabûtek bû. Tabûta mezin bû tabûteke teng. Pir aşkera ye ku nêzîkatiya dewleta tirk ya li hemberî serokatiya me di şexsê serokatiya me de tasfiyekirina tevgera azadiya gelê me ye."

__Dengê wijdana gel__

TEV-ÇAND'ê bang kir ku bila di serî de hunermendên ku dixwazin bibin dengê wijdana gel û hemû rewşenbîr, hunermend li hemberî vê yekê bi hîstiyarî tevbigerin û wiha hate gotin: "Divê em vê baş bizanibin ku di şexsê serokatiya me de aliyê kurdan yê herî mirovahî dikin 'çala mirinê' bi mirinê re rû bi rû dihêlin. Serokatiya me dîroka me ye. Ev îfadeya berhevkirinên çandî yên rastiya civaka me ye."

Di daxuyaniyê de hat gotin ku di serî de divê hunermend li hemberî vê rewşê bi hîstiyarî tevbigerin û di berdewamiyê de ev gotin cih girtin: "Divê saziyên me yên çandî û kesên bi hunerê re eleqedar dibin di nav serhildanên gelê me de cih bigirin û pêşengiya serhildanan bikin. Divê bê zanîn ku wekî gel û tevger mijara me ya herî hesas serokatiya me ye.


Ewlehî, azadî û tenduristiya Serokatiya me ji bo me mijareke ewqas girîng e ku ji bo wê hewcedarî bi nîqaşan nîn e. Hemû pêkanînên li hemberî Serokatiya me tê wateya pêkanînên li hemberî gel û tevgera me. Dewleta tirk her çiqas ji vê rastiyê haydar be jî bi zanebûn gelê me tahrîk dike. Giredayîna gelê me ya li hemberî serokatiya vî gelî û piştî êrîşa li hemberî serokatiya me bertekên ku derketin holê baş naxwînin. Vê wekî bingeha tahrîkê ya gelê tirk ku bi salan jê re şovenîzmê ve nexweşketina wekî taktîkekê dinirxîne. Nijadperestiya gelê tirk wekî astengiyên pêşiya xwestekên gelê kurd yên demokratîk dinirxînin."

__Polîtîkayên durû aşkera bikin__

TEV-ÇAND'ê hişyariya nêzîkatî û lîstikên polîtîk yên bi vî rengî kir û diyar kir ku bila rewşenbîr û hunermendên tirkiyeyî polîtîkayên durû yên AKP'ê deşîfre bikin û demeke ku gelê tirk û kurd bi lîstikan tên hember hev peywira xwe bînin cih û wiha hate gotin: "Divê hunermendên tirk û tirkiyeyî li hember şovenîzma ku xizmetî siyaseta înkar û îmhayê dike bi bertek bin. Divê têkoşîna gelê mafdar ya gelê kurd û xwedîderketina serokatiya vî gelî baş fêm bikin û bidin fêmkirin."

__'Bêdeng nemînin__

Di daxuyaniyê de hat gotin ku divê tenduristiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li ber çavan bê girtin û şertên jiyanê yên Ocalan demildest bên rastkirin û wiha hate gotin: "Tê zanîn ku nêzîkahiyên îmha û înkarê yên dewletê destnîşan dike ku rewşê rast nakin. Pir aşkera ye ku rastkirin dê bi têkoşînê ve pêk bê. Aşkera ye ku girtîgeha nû ku Serokatiya me birine wir 'çala mirinê' ye û ev pêvajoya tasfiyekirina Tevgera Azadiyê ye." TEV-ÇAND'ê di berdewama daxuyaniyê de careke din banga hîstiyariyê li hunermend û rewşenbîran kir ku li hember zilm û wehşeta ku li Îmraliyê pêk tê bêdeng nemînin. *BEHDÎNAN (ANF)*



*TEV-ÇAND'ê hişyariya nêzîkatî û lîstikên polîtîkayên AKP'ê kir û xwest ku rewşenbîr û hunermendên tirkiyeyî polîtîkayên durû yên AKP'ê deşîfre bikin û di demeke ku gelê tirk û kurd bi lîstikan tên hemberî hev, peywira xwe bînin cih.*



## '33 Gule'li Amedê bû

Lîstika bi navê 'Dîroka bi şîn a 33 Gule' ya mijara bûyera kuştina 33 kesên li Geliyê Sefo yê navçeya Qerqeliyê ya Wanê hatine qetilkirin vedibêje ji aliyê lîstikvanên Golge ya Enqereyê ve li Amedê hat pêşkêşkirin.

Lîstika bi navê "Dîroka bi şîn a 33 Guleyan" ya mijara bûyera kuştina 33 kesên di sala 28'ê tîrmeha 1943'yan ya li Geliyê Sefo yê navçeya Qerqeliyê hatin qetilkirin li Amedê di salona Şanoyê ya Şaredariyê de hate temaşekirin. Lîstik piştî Enqere û Qerqeliyê îcar jî li Amedê derket pêşberî şanohezan.

Di lîstikê de bi fermana fermandar Mustafa Muglali ve qetilkirina 33 gundiyên ku bê sûc û bê guneh bi şanoyê ve tê vegotin. Muglali ji ber vê bûyerê cezayê îdamê digire lê di girtîgehê de dimire û ev mijar di sala 2004'an de li Qerqeliyê ji ber ku navê Mustafa Muglali dabûn qişlaya leşkeriyê careke din ketibû rojevê. Derhêneriya lîstikê ji aliyê Îsmaîl Sivasli ve pêk hatiye û di lîstikê lîstikvanên şanoya Golge ku li Enqereyê xebatên xwe yên hunerê dimeşîn dilîzin. Zimanê lîstikê bi kurdî û tirkî ye û her wiha di nav lîstikvanan de zarok û lîstikvanên ku temenê wan mezin in jî cih digirin. **AMED**

## Promiyera Zimanê Çiya

Promiyera lîstika şanoyê ya bi navê 'Zimanê Çiya' ku derhêneriya wê yek ji navdarên Şanoya Forûmê Luciano Iogna dike û ji aliyê nivîskar Harol Pinter ku xwedî xelata nobelêyê hatiye nivîsandin, zextên li ser zimanê kurdî vedibêje. Şano dê di 11'ê kanûnê de li Şanoya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê (DBŞT) bê nîşandan.

Şanoya ku ji aliyê nivîskar Harol Pinter ku xwedî xelata nobelê ye ve hatiye nivîsandin û derhêneriya wê jî yek ji navdarên Şanoya Forûmê Luciano Iogna dike, zextên li ser zimanê kurdî vedibêje. Derhênerê şanoyê Liciano Iogna, diyar kir ku zextên li ser û pirsgirêkên civakî yên Kurdistanê gelek dişibin hev û wiha axivî: "Pirsgirêkên ku kurdên li Îran, Sûriye, Iraq û Tirkiyeyê dijîn, tên zanîn. Ji ber vê yekê jî ez gelek bextewar û bi heyecan im ku min bi kurdistaniyan re şanoyek çêkir." Iogna dest nîşan kir ku di vê lîstikê de dê temaşevan jî karibin xwe tevli lîstikê bikin û wiha lê zêde kir: "Amed dê şanoyeke ku pirsgirêkên wan dişibe hev temaşe bike. Dema ku em derkevin pêşberî temaşevanan, em dê inter-aktifiyê bibinîn. Em dê bibînin ku ka temaşevan bi nêrîneke çawa li pirsgirêkên xwe dinêrin û çareseriyên çawa dibînin."

**Zimanê Çiya yê Pinter**

Nivîskar Harold Pinter ku xwedî Xelata Wêjeyê ya Nobelê ye, di lîstikê de zextên li ser zimanê kurdî vedibêje. Şano, li ser dayikekê kurd a çiyayî ji ber bi zimanê tirkî nizane, nikare bi lawê xwe yê girtîgehê re biaxive hatiye nivîsandin. Di hevdîtinê de bi zimanê xwe tenê dikare bêje 'Min nan û sêv anîn.' Ji ber vê yek gardiayn lê dixe. Paşê jî dimire. **AMED**

# Bîranîn




**Medine GUL**
**(Xwinda Faraşîn)**
**Rojbûn: 1984**
**Şehadet: 4'ê kanûna 2007'an, Gabar**

*Li Gabar û Cûdî dinêrim*
*Dilê min difûre ji bêhna sêkuçê*
*Sê xet,*
*Sê çem,*
*Sê sînor diherikin.*
*Di nav şerîda dîrokê de*
*Ku tevayî demên dûr,*
*Ji min veşartî ne…*

**Malbata Gul**



# XAÇEPIRS

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | ■ | | | ■ | |
| 2 | | ■ | | | | ■ | | | |
| 3 | ■ | | ■ | | | | | ■ | |
| 4 | | | | ■ | | | | | |
| 5 | | | | | ■ | | ■ | | ■ |
| 6 | ■ | | | ■ | | | | | |
| 7 | | | ■ | | | ■ | | | |
| 8 | | ■ | | | ■ | | | ■ | |
| 9 | | | | | | | ■ | | |

**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1.** Tunekirina giştî... Di zimanê zarokan de lêxistin **2.** Yekeya giraniyê ku li Fransayê 30,59 gr û li Îngilistanê jî 28,349 gr û li Holandayê jî 100 gr ye... Bi erebî "ez" **3.** Çîrokên kin û piraniya wan li ser sewalan in û mirov tiştekî jê hîn dibe **4.** Qumaşê ku ji hiriyê çêdibe... Paytexta Bolîvyayê **5.** Şîrê kelandî yê havêynkirî **6.** Bi rûsî erê... Mêweya ku hîna kal û xang e û nayê xwarin **7.** Pirsek di rewşa ne tewandî de... Hejmarek... Beyreq, sembola welatan **8.** Sendîkaya Karkeran a Swêdê... Kurteya beriya zayînê **9.** Zarokên xwîşkê mirov... Nexweşiyek

**Ji jorê ber bi jêrê ve**

**1.** Îşaret, şop... Cînavka pirhejmariyê ya xwerû... Di zimanê zarokan de tiştê pîs û kirêt **2.** Celebek qaxizê nivîsê ku qalind e û rengê wî dişibe rengê kayê **3.** Baneşana ku pê ga tê ajotin û sekinandin... Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin... Notayek **4.** Kurteya ajansa nûçeyan a Firatê... Rengek **5.** 12 meh an jî 365 roj... Pirsek di rewşa tewandî de **6.** Awayekî danse, babetek ji şanoya muzîkal... Qertafeke neyînî **7.** Dengê ku ji tiştê dikeve avê dertê... Sir, tiştê her kes pê nizane **8.** Dadwer **9.** Qelîştek... Lehengê destana Newrozê

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | ■ | K | A | R | D | A | K | A | ■ |
| 2 | L | A | M | A | ■ | P | A | P | A |
| 3 | A | ■ | Û | ■ | Z | Î | N | ■ | D |
| 4 | M | A | R | S | ■ | K | ■ | T | E |
| 5 | ■ | M | ■ | A | N | O | N | Î | M |
| 6 | L | E | Y | L | A | ■ | A | R | ■ |
| 7 | A | D | ■ | Î | ■ | E | M | ■ | R |
| 8 | V | ■ | Î | S | A | ■ | E | S | A |
| 9 | A | R | Z | E | B | A | ■ | Ê | Z |



Evdile Koçer
evdilekocer@yahoo.com

## Rengên Xweasîmîlasyonê!

Hûn niha sedîsed wê meseleya hermet û malxwêyê malê dizanin: Ku yek ji mal de, yek jî ji derve 'mal'ê xira dikin. Vêca meseleya hebûna ziman û çanda kurdî jî hinekî wisa ye ku em hem li derve têne asîmîlekirin û hem jî em di mal de xwe asîmîle dikin. Yanî hem ji derve, hem jî ji mal ve mala çand û zimanê me xira dibe…

Em ji derve bi rengekî polîtîk têne asîmîlekirin, lê dema ku em di mal de bi awayekî însanî jî behsa hebûna xwe bikin, dîsa ev xwestekên me yên însanî jî bi rengeke polîtîk tê berovajîkirin û manûpilekirin.

Em di mal de jî bi rengekî polîtîk -lê bêhemdî!- xwe bi xwe asîmîle dikin, lê gava ku yek bêhemdî jî behsa hebûna xwe bike, mixabin ji hêla 'bira'yên din ve dîsa bi rengekî polîtîk tê berovajîkirin.

Êdî di mal de jî xwestekeka me ya herî însanî jî ji hêla birakên din ve wekî 'propaganda, milîyetçîlîk, kûrtçûlûk, polîtîk' têne manûpilekirin.

Dema em hinekî zorê bidin van xwestekên xwe yên herî însanî jî, hindik dimîne ku serê me bê şikandin, ev xwesteka me bi metodên nas di mal de jî têne terorîzekirin.

Helbet dewletên dagirker di êriş û polîtîkayên xwe yên asîmîlekirinê de jî heta radeyekê bê minet in!

Lê gelo em ê ji xweasîmîlasyona ku em şev û roj li dijî hev dikin re çi bibêjin.

Helbet derdê min ji xweasîmîlasyonê ne tenê ziman û çand e, lê rih, fikir, rabûn û runiştandin, orf û adet, û hemû heyîn û neyîna me ye jî!

Min ji tecrûbeyên xwe, vê yekê fêm kiriye: Di nav hin kurdan de meriv ne tenê behsa azadiya Kurdistanê, lê behsa seksa kurdî jî bike, behsa şekaleke kurdî jî bike, wê ji hêla wan ve wekî mesaja siyasî-polîtîk bête binavkirin.

Em tireke kurdî jî bikin, em weke parsekên kurd mal bi mal jî bigerin, em di halê xwe de bi têra xwe bi kurdî jî bigirîn, wê ji hêla hin tirkmancên malê ve wekî helwesteke polîtîk bête berovajîkirin. (Xwestekên polîtîk jî helbet her dem rewa ne!)

Ji ber ku ew bi rengeke polîtîk hatine asîmîlekirin, loma xwestek û helwestên me yên herî rewa jî wekî meseleyeke polîtîk bi nav dikin û çirtovirto dikin.

Mixabin sîstema dewleta tirk heta radeyekê hişê me manûpile kiriye û çeliqandiye; êdî em nikarin di nav deh kurdan de rasterast behsa hebûna xwe jî bikin. Dema em bikin jî em ji hêla wan birakên xwe ve xwedêgiravî li ser navê welatparêziyê bi metod û rêbazeke melahîm ve têne perçiqandin û recimandin…

Em gelek caran dikarin li dijî dewletê jî derkevin û behsa ziman û Kurdistana xwe bikin, lê em nikarin li dijî hev derkevin û doza hebûna xwe li hev bikin…

Em gelek caran bi çalakî û xebatên xwe ve sîstema dewletê jî dixetimînin, lê mixabin em nikarin wisa hêsanî sîstema ku dewletê di nav me de saz kiriye bi çalakiyekê ve xira bikin û bipelişînin.

Dêna xwe bidine tirkiya ku di saziyên me de kon vegirtiye, dêhna xwe bidine 'welatparêziya bi tirkî' ya ku hukim li kurdî dike, hûn ê hingê vê sîstema ku di nava me de rûniştiye çêtir fêm bikin…







## Ma te hişt ez wekî însanan bikim



Rojekê xortekî bi navê Xalis dikeve nav rezê mala apê xwe. Di jiyana gundîtî de kê ji rezê kê çend ûşî tirî jêkiriye ne girîng e. Kes ji bo têrxwarinî li dijî jêkirina ûşiyek tirî dernakeve. Lê amojina (jinap) Xalis jineke gelekî bi teşqele ye. Çawa ku dibîne zarokek di nav rez de ye, dibêje "haho dîsa rez talan kirin".

Bi qerepere û hawara amojina wî Şemê re Xalisê te ji nav rez direve. Ûşiyê tirî jî bera nav bena rez dide û xwe di ser benê re davêje. Lê Şemê xwe digihîne wî û hişk bi kurrika stûyê wî digire:

- "Te, te, te çi dikir kuro? Te çi, çi, çi, çi dikir? Ka, ka, ka bêje! Zû zû zû..."

- Lawikê reben ji tirsa dibêje "Wwwwele min gûyê xwe dikir." Lê amojina wî bawer nake. Dibêje:

- Ka te li ku gû kiriye, nîşanî min bide.

## Dilê wê ketiye min...

Rojekê mirovekî gundî bi rêwîtî di ber gundekî cîranê xwe re derbas dibe. Jixwe dema ku ew derbas dibe êvar bûye. Heywan û sewalên gundiyan ji çokê vedigeriyan malên xwe. Di dema derbsbûna wî de qîzeke ciwan li qeraxa gund rastî wî tê û jê re dibêje, "lo birawo birawo zû ji wî aliyê de tê wextê ku tu hatî te bi rê de kera me nedît."

Ew jî ji qîzikê re dibêje, "na min bi rê de tu tiştek nedît."

Qîzik vedigere dere mala xwe.

Ew jî çiqas nakokî û çelîşkî hebûne tevde dikevin nava dil û serê wî. Dûre ew ji xwe re dibêje 'welehîn dilê wê ketiyê min, heke dilê wê neketa min ma ew ê çima pirsa kera xwe ji min bikira?' Ew bi vî awayî bi lez û bez dere mala xwe, gazî çend heb heval û derdorê xwe dike. Ji wan re dibêje: "Ez îro çûme filan gundî, min û qîzekê ciwan soz daye hevdu ku îşev em ê hevdu birevînin. Hûn jî werin alîkariya me bikin." Ew û hevalbendên xwe tevde radibin bi rê dikevin, tên ciyê ku qîzikê pirsa kera xwe ji wî pirsî bû, rûdinin.

Ew ji wan re dibêje: "Me li vira soz daye hevdu. Ew ê were vira, em ê jî wê bivin malê." Ew hetanî şeveqê li benda qîzikê disekinin. Ba û baran li wan dibare tevde şil û perîşan dibin lê qîzik nayê. Hevalên wî gelekî aciz dibin, êdî sebir û tehemûla wan namîne. Jê re dibêjin: "Ma we çawa soz da hevdu? We ji hev re çi got, em ji êvar de li ber vî ba û baranê perîşan bûn. Çima sozdara te nayê yan jî henekê xwe bi te kiriye? Kanî nehat."

Ew jî li ser van pirs û gotinên hevalên xwe ji wan re dibêje: "Na wele henekê xwe bi min nekiriye. Ez ji wî alî de dihatim ew jî li vê li ser riya min sekinîbû. Wextê ku ez hatim nêzîkî wê, wê ji min re got: 'Lo lo birawo, tu ji wî aliyî de tê, wextê ku tu hatî te bi rê de kera me nedît?' Min de got: "Na min kera we neditîye. Ew çû mala xwe û ez jî hatim malê û min gazî we kir."

Hevalê wî dîsa jê re got: "Sozdayîna we hemû pirsa kerê bû?"

Wî got: "Erê, heke dilê wê neketibûya min ma ew ê çima pirs û sûala kerê ji min bikira?"

Hevalên wî jê re gotin: "De rabe ser xwe lo, te ji êvar de li ber vê ba û baranê em perîşan kirin, em herine mala xwe." Wî ji wan re got: "De hûn herine malên xwe, ez ê li vê li benda sozdara xwe bimînim… wê soz daye min, dilê wê ketiye min…"

NAÎL DEMIR

www.arsivakurdi.org



Arjen Arî
arjenari99@yahoo.com

# Veger

Bayê payîzî yê ku ji hêla newalê ve dîn dînoke diwirwirî û dihat, û mîna şiqamêkê xwe li rûyê derî û paceyan dida, û paşê bi heman xezebê her pela zerirî ya li kolanên xofgirtî; li tevî kaxiz, pûş û poşetên li ser rê û peyarêyan dida ber hembeza xwe û ji hêla Girhesin, Kanîkan û Doqsanbîrê ve serberjêrî Binê Xetê dikir; bi hatina zivistanî re; şevên dirêj, ba, bapeşk û barana ku şilî û şepelî bi xwe re anî re, pêjna surşikestina Bayê Îlonê da xelkên herêmê, niştecîyên navçeyê û gund û mezreyên li derûdorê…

Hatina barana ewil, û paşê quregura tavên piştî vedana berq û birûskan, weke kezik û kurmik, xilt û mar û marmarokan, kir ku mirov jî kumê germ ê zivistanî bidin serê xwe, reşahiyê şevê bikin rûpûş; û qe nebe heta serê bihara serîhildêr, ketina pilingê av û hewayê vekêşin xewlederan, xwe veşêrin di qorzî û qawêrên demsala bi ser bextê reş de hatî…

Vê axê, vî welatî li tevî her navçeyê bi her gund û mezreya yekmalî ve gellek zivistanên sext û dijwar dîtibûn.

Li gorî çîrok û çivanokên rihspiyan roj hatibû, zivistanan xela cela anîbû bi xwe re, û li van deran kiribû ku mirov li azyê, heywanên kerûlal ên di axuran de tewilandî, telef bibin ji bêêmî…

Di şibekaya berê wê li hewşê, niha ji hêlekê de çîroka serboriya sala 'berfa sor' tînim bîra xwe, ji hêlekê de li qepalên berfa sik î spî dinerim.Her libek mîna kuliyekî beşik girr, gurdkî diçe vî alî wî alî, û tê tê li ser şivên şaxên rip î rût ê tuya li hewşê a terr terr mahdzer, bejn û gulî zer, tik î tenê bikedermayî datînin. Her şiva ji şaxê çûyî di bin masûrê berfê de mîna zemanê serê xwe ji demê re xwarkirî, xar xar serberjêr bûne…Ev çimîn û xwarbûn dibe dilîneke xemperr di hinavên de û min ê li keviya sobeya ku tîhna xwe dide paqê min, dilerizîne, û dike ku pê re pê re tevzînokên tirsê weke mîrovên hûrik î sorik hilkişin bi laşê min ve…Ev ricf û lerz bêhemdê min dike ku pirseke ku bi her delîveyê ji xwe dikim, dîsa bikim: Niha çend cendirme li dû, serbazek ji ev ên mahdtirş û mirûskirî bêyî ku li deriyê hewşê bidin, bikevin hûndir û bibêjin 'Lo looooo…em li te digeriyan kewkê kedî'; ez ê bi ku ve birevim?

Dibêjin yên ku serberjêrbûn, filitîn; yên mane dê her bêne girtin!

Gellek caran hatim desteserkirin.

Lê girtineke dûrij nebû pahra min.

Jixwe min qet û qet ji girtina ziviztanan hez nekir, nakim jî! Ew mexzenên sar, reş, bîhnhêwî…Û nexasim ev jop, destîbivirên ji dara berû, stûr, qayim..?Ez bême girtin dibêjim, bila an serê biharî be, an jî destpêka havînê. Lê; weke her kesê li wî welatî herder, hercih pinpê û hêsîr, incex rew bikare min aza û azad bike û dûr bixe ji tirs û xofa ku niha di nav û hinav û mêjiyê min de dilive!

Ne ku negotin min, ' xwe hazir bike, û tu jî vê şevê serberjêr bibe, bireve'! Her ku ji min re ev pêşniyaz hete kirin, min man û rev berawerdî hev kir, û min got, 'na bira, na… ez naçim'!

Birastî, ez ê bi ku ve biçûma heta ku evên li ser axa min çarmêrkî rûniştî, ranabûna, ranehiştina teşkên xwe û neqeşitîna..?

Vê hizrê, hizra mayîna wan û neçûna ji ser axa min, dikir ku ez jî nikaribim pişta xwe bidimê û biçim û her biçim…

Lê gellek çûbûn…

Hê jî diçûn…

Hem jî qefl bi qefl…

Hem jî li dû hev, di şevekê de…

Jixwe digotin, yên ku çûn êdî zor vegerin.

Hinekan jî digot, her çûn hetinekê dihewîne di hûndirê xwe de.

Min di hûndirê xwe de ne çûn; mayîn hewand û min ew meyand û kir sebr û semaxa temênê xwe …

Niha, piştî evqas salên derbasbûyî, bi dû yên çûyî de dihizirim û diçim diçim li ber derê kampa Maxmûr radiwestim.

Tê digihijim, fam dikim ku kesek wisa bi hesayî naxweze pişta xwe bide axa xwe, war û wargehên xwe, mal û milkê xwe; şopên zaroktiyê, dewsên sîpetiyê, mextel û mekanê dildariyê…

Û têdigihijim, û di ber xwe de dibêjim 'çivîka çivîk heta ku hêvî û emela xwe nebire ji hêlîna xwe ya xirabûyî, her li derûdora dara ku hêlîn li serê, tê û diçe, diçe û tê'…

Lê…lê ku hêviya xwe dibire, û difire?

Çivîka bi qasî lepekê, piştî du sê baskvedanan, tu dibîne ku ji ber çavên te bi dûr ket û wenda bû!

Maxmûrî jî weke çivîka hêlînhişweşiyayî, ji gundên xwe yên li derûdora Çiyayê Cûdî: ji Şaxê, ji Hebler, ji Zirêstên… mehdik û sel û çend alêvên din li ser pişta hêştiran girêdayî, gelekên wan pêxwas peya di şiverên çiyayên xwe re di sala 1992wê de serbejêrî Başûr bûn

Û çûn, ew çûn!

Niha jî wezîrekî zîrek dibêje, ' Wê vegerin'!

Tu herî ber piyên wan jî, heta tu azadiyê pêşkêşî wan nekî, ew wisa bi hesanî venegarin, hemşeriyê min!

ALAN JOUFFROY

# Helbesta Andre Breton -II-

Breton bixwînin: Di hevoka wî de, mîna hişmendiya di zelaltirîn qonaxa xwe de, jiberxweveyî û zikmakayî dipijiqin. Hizrên xwe yên dadayî û bangên xwe li ser hevokan ferz dike.

Çameya Breton, bi vê rîtma xwe û bi vê zelaliya xwe û bi vê payedariya xwe, di hebûna xwe de xwe dispêre yasayeke xweser û yekane: Dilbijandina herî giranbuha.

Semageriya giyan ya bi lêş ve girêdayî ye, û semageriya zeynî (zihnî) jî ji bo bûneverê mirovî, bi gelemperî, derbasbûna metirsiyên ku ti carî bawer nedikir ku dê zora wan bibe, pêdivî ye.

Pêşveçûn, ji 'RAZ' hetanî BAYÊ AVÊ' ne bi awakî rêkûpêkane ye. Deng jî hergav ne di yek çeşnî de ne. Malik berya niha nehatine bihîstin. Matmayîn bi awakî berz amade ye.

Plana pêşîn a çameyê ya ku rev jê nîn e ew e ko, hewldana yekemîn a nivîsandina çameyê biryarê li ser her tiştî dide: Li ser çawa destpêkirinê, li ser rîtm û beşavendê (qafiye- theme), li ser guhertin û rawestek û bandûrên wê.

Hişmendî û ramyariya Andre Breton jî ji vê pêk tê ku dizanîbû çawan desthilata fermanê pêşkêşî wê hewldana yekemîn bike, çinkî bêyî vê yekê jî, kîjan helbestvan be dikare şansên xwe yên ji helbestê winda bike.

Helbestvan e û teorîzanê vê mêkanîkê ye; mêkanîka ku xirecir û tevlîheviyeke bê veger xistiye rêbazên nivîsandin û ramanên kevnare de.

Andre Breton, tenê, di nav helbestvanên şoreşgêr de yên ku li Fransayê di dawiya sedsala 19 an de ji dayik bûne, dikare mezintirîn helbestvan be. Breton di sala 1896 an de hatiye dinê.

Helbestvan û teorîzanê vê mêkanîzmê, A. Breton, cara pêşîn helbestê- ji De Lautrèamont û vir de- digihîne rexê dîtir ê babetên wêjeyî, û cara pêşîn jî piştî Apollinaire bran (burhan) kir ku helbest ne hema di pirtûkê de têt bi cîkirin, lê pirtûk jiyan e, kolan e, hevdîtin e, rûdan e, bûyer e, û ji ber ku ev tişt hemî ne, pirtûk; em bivên nevên dê wisa be, bi taybetî di wê pêvajoya ko, dem û cî, tê de, wek agahî û ezmûneyeke berdewam bin; ezmûneya wê rastiya ku hêjî li ser piyan ranewestiyaye, û rastiya ku xwe ji meşê re amade dike.

Lewra 'realîzm' ku hergav şanoya sîbereke hejar bû; îro mezintirîn xapandinên çandê ye; ji wan xapandinên ku mirov xwe bi xwe xwe pê dixapîne.

Li hemberî vê jî, hizir û bîr û prinsîp û teoriyên suryalîzmê ji berhemên xwe tekûztir û hêzdartir in. Ji vir û pê de, suryalîzm wek destpêka ramana pêşerojê û wek sînorê ku mirov nema bixwaze di hundirê hevokên mirî de û di hundirê vê sîbera çandî ya ku jiyana wî ya hişmendî û zeynî û evînî û siyasî dixeniqîne, bijî, xwe pêşkêş dike.

Dê ji me re bibêjin ku suryalîzm berya çel salan li ser piyan e. Emê bibêjin ku komunîzmê not û şeş salan bendewariya serkeftinê kiriye, herwiha emê bibêjin ku ji çel û du salan ve em di çeşnê Komûneke ramanî de dijîn, Komûnek e, û li Versailleseke dîtir ku roj bi roj çekên wê û nokerên wê pirtir dibin, dorpêç kiriye. Komûnek ku di rewşa xweparastinê de be, ti carî bi rêkûpêk nabe.

Ez di wê baweriyê de me ku azadiya lêş û azadiya awez (aqil) dê 1917 eke taybetî ji bo xwe bi destxînin, û ev 1917 eya han bêguman dê zora 1879 an -mebest sala Komûna Parîsê ye- bibe.



"Kevana spî ya ku li ser pişteke reş hatiye nîgarkirin û em navê ramanê lê dikin" bi tu kesî ve negirêdayî ye, hetanî bi xwediyê xwe ve yê ku afirandiye jî girêdayî nîn e.

Cîhan û xwîn û raman, di nêrîna helbestvan de yek tişt in, tu diramî, (difikirî) dêmek tu di cîhanê de xwînê dirêjî.

Û Bretonê ku bi awakî mat û balkêş daye nîşankirin ko" de Lautrèamont û Rimboud du teorîzanên dijwar in" dibîne ku ne hema gerek her kes helbestê binivîsîne lê li her cihê û di hemî barûdaxan de û bêyî cihêwazî (istisna) gerek bête nivîsandin. Eger helbest li cihekî ji cihan rawestiya, eger sînor ji bo helbestê hatin danîn, dê helbest ji jiyanê bête birîn û helbestvan bixwe jî di hebûnê de dê raweste. Wê çaxê çareya yekemîn, bi rastî, xwekuştin e.

Madam raman li ser piyan e, û dikare bi rê ve biçe û madam nivîsandina mêkanîkî, eger gotarek e seyr di rojnameyekê de be, hevpeyivînek e bêdeng hetanî destê sibê bi jinekê re be, yan jî li ser keviya qutiya cigareyan nivîsandî be yan jî li girtîxaneyê be, dikare dengê xwe bigihîne, Madam bext berfireh e û madam hêvî û bêhêvîbûn di mêzênê de ne, tenê şiyana helbestê dimîne da ku mirov bikaribe di tunebûna xweşî û evînê de ziyaneke zorbaz nebîne,

Di xemgîntirîn û dijwartirîn barûdoxên, ku reng e (belkî) helbestvan di wan re derbas bibe de, rêkewt(sudfe) û bext hene. Ev pevgirêdana seyr a di navbera pêwistiya xweristî û pêwistiya şexsî de heye; bi taybetî cihekî hevdûbirînê heye, cihekî giyanî û cihekî dî fîzîkî hene û di van cîwaran de xebatkarên Komûnê ramana ku ez li ser dipeyivim, radiperînin.

Di van cîwaran bixwe de Breton tişta ku nivîsandiye nivîsand û tişta ku jiyaye jiya. Tişta ku jiyaye nivîsand,: 'Nadja', 'Stûnên 17', 'Elewanî Elmustetreqa', û tişta ku nivîsandiye jiya: 'Daxuyanî', 'destpêka rojê', 'Evîna şêt', 'Kilîta revê', û di 'Hejariya realîteyê' de rastiya ku her tiştî dinixumîne û tu tiştî cihê nake, dixuye.

Hemî helbestên Breton û hemî helbestên rastîn wek rêkewteke (korfelaqiyeke, sudfeyeke) ne subjektîv û ne jî objektîv dikarin bên pênasîn, rêkewteke ku hilperikînê diafirîne, rêkewtek e, û 'berê kûrahiyê' tê de berbiçav e.

Li vir, li ser rûpel, wek ku elend bi ingirîn û bi kevokan hatibe dabeşkirin, wek ku pinpinîkan bi ser çirê de bibarîne; çira ku jineke evîndar li jêr wê rût û bi dilgermî rûniştiye.

Helbestên Breton bixwînin, hûn dê demê û şûnê, ji hevdûrketin û pevgirêdana henasan (nefesan) û ramanê bixwînin. Hûn dê hemî zîvirandinên dema zeynî (zihnî) bijîn, ku bêyî wê dê jiyan rêçeke kurt î bê mebest be.

Suryalîzim wek dergehê takekesiya şoreşgêr, ne dibistan û ne jî rêbaziyek e, û ne jî dikare bibe formek ji formên derbirîna çandî.

Gelek helbestên ku cara pêşîn ji sala 1921 ê de li vir di 'ronahiya zemînê' de belav dibin, tu tiştî dernabirin, û ne jî dixwazin tu tiştî derbibirin. helbestvanê mezin derbirînê nake lê dibêje û dipeyive. Bi peyivîna wî û bi nivîsandina wî azadî dibe şepalek û cîhan jî dibe şêrek, dîrok jî hemû dergehan dihejîne û hemû zindanan diherifîne.

Takekesiya şoreşgêr, di baweriya min de, "pir jidayikbûna ezê" ye, li hawirdora wê û carcaran bi awakî nakokane û cihêreng gelek hişmend û behremendên hevbeş dicivin: San Gost, de Sade, Max Shternar, de Lautreamont, San Paul û Breton, Antonin Artaud, Patay, Henri Michaux. Ez dê li xwe mikur bêm, û ji xwe, dê kutahî jî li vir be, helbesta Breton navê her pirtûka girtî ya çi laşî be di xwe de dihêwirîne. Û her laşek jî pirtûkeke bi ser hemî peyvan û hemî navan de vekiriye. ***(qediya...)***

**** Alain Jouffroy ku yek ji hevalbendên Breton bû, ev nivîs di 3 yê temûza 1966an de wek pêşgotin ji bo pirtûka Breton a bi navê Ronahiya zemînê, nivîsandiye.***

***Werger ji DUGIR***

ROJEV
4 Kanûn 2009 Hejmar: 22 Sal: 1 E-mail: awelat2002@yahoo.com

## Li Îdirê stargeha sewalan hate vekirin

Şaredariya Îdirê, bi armanca sewalên bêxwedî û li kolanan bipareze stargeha sewalan vekir.

Şaredariya Îdirê bi armanca parastina sewalên bêxwedî û li kolanan, stargeheke ku ji 900 metrekareyî pêk tê ava kir. Stargeha ku ji 57 xanîkên sewalan pêk tê, bi merasîmekê ket xizmetê.

Di vekirina stargeha sewalan de Parlamentera DTP'ê ya Îdirê Pervîn Buldan, Şaredarê Îdirê M. Nurî Guneş, Endam û rêveberên DTP'ê yên navendî û bajêr amade bûn. Şaredarê Îdirê M. Nurî Guneş, di vekirinê de axivî û diyar kir ku di çarçoveya felsefeya rêveberiya demokratîk, ekolojîk, azadiya zayendî û wekheviyê de tevdigerin û xizmetê dikin. Guneş, da zanîn ku wan li gorî vê felsefeyê ev stargeh vekiriye û dê xizmeta xwe bidomînin. **ÎDIR (DÎHA)**



# Zarokên seqet ji bîr nekirin

Bi munasebeta Roja Seqetan a Cîhanê Cîgirê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê Alî Şîmşek, şaredarên navçeyên Amedê û nûnerên Platfroma Seqetan çûn serdana zarokên seqet. Her wiha şaredaran bi diyariyên cur bi cur zarok kêfxweş kirin

Cîgirê Şaredariya Bajarê Mezin ê Amedê Alî Şîmşek, şaredarên navçeyên Amedê û nûnerên Platforma Seqetan li saziyên perwerdehiyê yên seqetan geriyan û diyarî li zarokan belav kirin. Her wiha Şîmşek pêşangeha wêneyên ku ji aliyê zarokan ve hatibûn çêkirin jî vekir.

Bi wesîleya 3'yê Kanûnê Roja Seqetan a Cîhanê li seranserê bajar bernameyên cur bi cur pêk tên. Di çarçoveya aktîvîteyan de Cîgirê Şaredardariya Bajarê Mezin a Amedê Alî Şîmşek, Şaredarê Kayapinarê Zulkuf Karatekîn, Şaredarê Sûrê Abdullah Demîrbaş, Cîgirê Şaredara Baglarê Fecrî Tayfur, Serokê Komeleya Seqetan Guler Înal, ji Meclîsa Yerel Gundem 21'ê Ramanzan Serîm, ji Sekreteryaya Platforma Seqetên Amedê Kahraman Elaltunkara, Endamên Lijneya Rêveberiya Komeleya Hemû Seqetan Abdulkadîr Altan, Endama Lijneya Rêveberiya Tum Bel Senê Fatma Kuyucu, Endamê Lijneya Rêveberiya Komelya Seqetên Surkentê Bulent Mazak û Serokê Komeleya Kuluba Sporê ya Seqetên Nabînin Emîn Baran saziyên perwerdehiyê yên seqetan ziyaret kirin.

**Dem dema guherînê ye**

Alî Şîmşek û endmên platformê pêşî dibistana Seretayî ya Seqetan a Nabihîzin a Sirkentê û dibisatana Seretayî ya Seqetên Nabînin a Alî Îhsan Arslan ziyaret kirin. Midûrê Şaxa Xizmetê ya Seqetan Medenî Alpkaya jî ligel wan dibistan ziyaret kirin.

Cîgirê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê Alî Şîmşek li vir axaftinek kir û diyar kir ku ya girîng ev e ku di mejî de guherîn pêk werin û ji bo vê jî derfet bên dayîn. Şîmşek wiha dirêjî da axaftina xwe: “Divê ji bo komên dezavantaj derfet bên dayîn. Lewre ji bo seqetan jî divê hewldan hebin. Ji bo seqetan ev gelekî girîng e. Ji ber vê ez spasiyên xwe pêşkêşî mamosteyan dikim. Hewldan û xebatên wan gelekî girîng in û ji destê me jî çi bê em ê bikin.”

Midûrê dibistanê Omer Dundar jî axivî û anî ziman ku seqetî ne tenê ne ew e ku ling li ser piyan nasekinin. Dundar wiha pê de çû: “Li gorî min seqetî alîkariya ku nagihîje wan e. Ji bo wan ev seqetî girîng e. Niha binesaziyên me yên fîzîkî amade ne. Lê em xwendekaran ji bo xwe nabînin. Em niha zehmetiyan dikişînin. Gelek zarokên me yên di vê rewşê de ne hene. Ev zarokên me terkî qedera xwe hatine kirin. Ji ber vê em ji Şaredarî û çapemeniyê alîkariyê xwest.”

**Çi ji destê me bê em ê bikin**

Şaredarê Kayapinarê, Şaredarê Sûrê û endamên platformê çûn serdana Dibistana Perwerdehiyê ya Ayten Elyesa Eryesa û Navenda Perwerdehiyê ya Kar. Şaredaran li vir pirsgirêkên wan yên budçeyê guhdarî kir. Şaredarê Kayapinarê Zulkuf Karatekîn di axaftina xwe de bal kişand ser seqetiyê û got ku em hemû namzetên seqetiyê ne. Karatekîn bi lêv kir ku dê bi rêxistinên civaka sîvîl re di her qada jiyanê de piştgiriyê bidin seqetan.

**‘Karê wan zehmet e’**

Şaredarê Sûrê Abdullah Demîrbaş jî da zanîn ku mamostetî karekî gelekî zehmet e û pîşeya wî ya rastîn jî mamostetî ye. Demîrbaş wiha berdewam kir: “Li cîhanê karê herî zehmet mamostetî ye. Her wiha pîşeyeke herî bi rêz û girîng e. Hele mamosteyên ku van zarokên seqet perwerde dikin, karê wan gelekî zehmet e. Ez wan hemûyan pîroz dikim.” Piştî axaftinan şaredar çûn cem zarokan û diyariyên wan danê.

**Pêşangeha wêneyan**

Di çarçoveya bernameya li Salona Pêşangeha Surmerparkê, pêşangeha ku ji berhemên zarokan pêk dihat hate vekirin. Cîgirê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê Alî Şîmşek bi zarokên seqet re tevli merasîma vekirina pêşangehê bû. Şîmşek li vir hemû hilberînên zarokan dît û kêfxweşiya xwe anî ziman. Her wiha Serokê Komeleya Rehabîlîtasyonê û Perwerdehiya Taybet Selîm Kaplan jî bi Şîmşek re geriya û der barê xebatan de agahî da. Vekirina pêşangehê bi kokteylê berdewam kir. **AMED**

## Ji her du kesî yek nexweşê gastrîtê ye



Gastrît; di madê mirovan de nêmgirtina mukoza yê ye. Bi piranî di mirovên gihîştî yên temenê wan pêşveçûyî de tê dîtin. Dîsa di hemû beşên civakê de tê dîtin. Bi piranî gastrîta kronîk (muzmîn) tê dîtin. Li gor ulserê xesareke banegehî heye.

Lê dema bi pêş ve here, dikare kûr here û derbasî ulserê bibe. Gastrît, bi piranî di encama enfeksiyona bakteriyel de pêk tê. Bi dermanên antibiyotîk ên tîr tenduristî tê pêkanîn. Di nav civakê de ev nexweşî tim tê dîtin. Ji ber ku di pirê mirovan de ev nerehetî heye, ji du mirovan yek nexweşê gastrîtê ye. Sedemên Nexweşiyê: Awayê xwarin û vexwarinê, di çêbûna gastrîtê de bandoreke girîng e. Hay ji xwarin û vexwarina xwe tunebûn, vexwarina alkolê, qata made qul dike û dibe sedema gastrîtê. Kişandina cixareyê, sinêra ku li ser made bandora wê heye hişyar dike û avzêya asîdê zêde dike. Asîda zêde jî dibe sedema gastrîtê. Dîsa stres jî dibe sedema gastrîtê. Yên bistres bin bi wan re asîd zêde tê avzêkirin. Ev jî rîska gastrîtê pêk tîne. Hinek dermanên ji bo nexweşiyê jî made rûdixînin. Dermanên wek Aspirîn ku asîd tê de heye yan dermanên bayê ku êşê dikujin jî zerarê dide madê. Tevlî van encaman ji ber nexweşiyên gurçik, kezeba reş û zehmetiya bêhnê jî nexweşiya gastrîtê derdikeve. **AMED**

## Kesk sor û zer ketin nav bûkiniyan jî



Kesk sor û zer ku demeke dirêj ji ber ku rengên kurdan in, hatibûn qedexekirin êdî li Amedê li mixazeyan vîtrinan dixemilînin. Ferhat Kamali rengên bûne sedema girtina gelek kesan anîn cem hev û bûkaniyek çêkir. Kamali got xeyala xwe ya bi salan bi çêkirina vî bûkaniyê bi cih aniye. **AMED**

# Li Tirkiyeyê hejmara xizanan zêde dibe

Li gorî encamên sala 2008'an a ‘Xebata Xizaniyê’ ya Saziya Statîstîkên Tirkiyeyê (TUÎK), li Tirkiyeyê rêjeya xizaniyê ji sedî 17.11 e. Li Tirkiyeya ku 11 milyon û 933 hezar kes xizan in, xizaniya herî zêde kesên li çolteran dikişînin.

Li gorî rapora ku TUÎK'ê îro aşkera kir, xizaniya li Tirkiyeyê li gorî 2007'an 0.68 pûan kêm bûye û dakete ji sedî 17.11'an. Li Tirkiyeyê di 2007'an de rêjeya xizaniyê ji sedî 17.79 bû. Li gorî xebatê li Tirkiyeyê 11 milyon û 933 hezar kes xizan hene. Di sala 2008'an de hate tespîtkirin ku sînorê birçîbûna malbateke 4 nifûs 275, rêjeya xizaniyê jî 767 lîre ye. Li gorî xebatê xanî çiqas mezin dibin, rîska xizaniyê jî zêde dibe. Hate ragihandin ku di nava xizanan de herî zêde kesên li herêmên çolter dijîn xizan in. Di sala 2008'an de rêjeya kesên ku bi meaş dixebitin ji sedî 5.93 bû, ji bo kesên bi heqdestê dixebitin ev rêje ji sedî 28.56, ji bo karsazan ji sedî 1.87, ji bo kesên bi hesabê xwe dixebitin 24.10 û ji bo kesên weke karkerên bêpere yên malbatê dixebitin jî ev rêje ji sedî 32.03 hate tespîtkirin.



Di berdewama raporê de tê aşkerakirin ku rêjeya perwerdehiyê çiqas bilind dible rîska xizaniyê jî ewqas kêm dibe. *(AKnews)*



## Dema tîmsah birçî dibin

Tîmsah xwe bi masî, çûk û sewalên behrê xwedî dikin. Her wiha dema ku birçî dibin êrîşên wan ên hovane jî hene. Bi taybetî dema ku birçî dibin êrîşî mirovan jî dikin. Diranê tîmsahan gelek bihêz in. Zindiyên ku dixwin jî parçe nakin û her wiha nacûn jî. Bi awayekî necûtî dixwin. Ji bo dehandinê (hezimkirin) keviran jî dixwin. Piştre bermayînên nava diranên xwe diavêjin derve. Ji ber ku dehandina goştê teze zehmet e, vedireşin û piştre dixwin.

www.arsivakurd.org